Kardox û Kudî Medên Aryanî
ne bê Xweda man û ne bêxanî,

Dicle û Ferat e şên û şînahî
Mezra Bota ye warê ronahî;

bi dêr û camî ev axa giran
destên bîyan de evro Kurdistan

rastiya çirokê...

62.

ewe tekoşîn, ew hesinkerek
li ser vê riyê leheng û rêberek

bû armanc û doz, û ket jîya me
nemirin bi me re pir Kawayê me:

bi navê Seîd, Rizo û Bedir-Xan
bi namê Qadî, Mahmud û Berzan

û, jîyan bi me re...

Nav û nîşanên kurdên êzidî û Şêx Adî*

QANATÊ KURDO

Werger: Mîkaîl Canpolat

Bi nivîsara Şakîr Fettah, Şêx Hesên di sala 1195 ji dayîka xwe bûye, ku ew neviyê birê Şêx Adî bûye. Bi agadariyên nivîskarên ereban, Şêx Adî di sala 1062 da çûye rehmetê. Dinivîsên ku nav û nîşanên Şêx Adî ev bûne: Şêx Adî Îbn-Mîsafir Merîwan, hozanekî bilîmet û zanayê dîn û diyanet bûye û nivîsarên wî bi zmanê Erebî hene¹

Bi vê yekê em pê dihesîn, Şêx Adî û neviyê brayê wî Şêx Hesên bi esle xwe ji bînemalêkê, ji xelkê Merîwanê bûne.

Eva nîşan dike, ku nivîsandina pertûkên dînê êzdiyan bi navê du merivana ve girêdaye; herdu meriv jî Şêx Hesên û Şêx Adî bûne û her du jî merivê hozan, bilîmet û zana hatine pêkanînê.

Eva pîrsa mihîme û bi ferze. Di dîrokê da eyane, gellek kitêbên dînî, filosofi dîrokî û şaristanî bi destê merivên ne ereb, bi destê farsan, Tirkan û kurdan bi zmanê Erebî hatine nivîsandînê. Le qet kesek nabêje û nanivîse ku nivîsarên: Wan meriv ne yên Erebîne, kesek usan jî nanivîse ku ew nivîskar bi eslê xwe ereb bûne.

Usan jî kesekî ne nivîsiye û nanivîse, ku bîr û bawer, diyanet û mehrîfeta wan kitêban ne yên musulmaniyê ne; kesek tiştên awa heta niha nenivîsîne, ji kîjan neteweyiye? Pîrsa girîng ne ewe; Nivîskar ji kîjan neteweyiye? Pîrsa girîng ewe bi çî nivîsar batine nivîsandînê? Û derheqa çî di wê nivîsarê da hatine nivîsandînê. Meseleke heweskar û înteras jî heye; pêwîste ez wê jî bêjim. Ew pîrs ewe, ku heta niha di nav êzdiyan da şîweyên dîn û diyaneta êzdiyan yên bi zargotî jî hene. Lê sed car mixabin, heta niha ew tekst kêmtî hatine kom kirinê. Eger ew nivîsandî bûna, çapkirîbûna me dê ew beramberî tekstên Anastas Marî çapkirî bikira û em dê pê bihesiyan; qîmeta wan dîrokî û şaristanî çîye?

Heta niha li Sovyetîstanê her du tekstên folklorî yên dînê êzdî ji zarê şêxan hatine nivîsandînê. Ev her du tekst jî niha li cem min in, her du jî zaravê Kurmançî ne. Ew derheqa efrandîna dunyayê negil dikin. Tekstek bi destê Roza Kazaryan, jî zarê Şêx Hemze di sala 1920 da hatiye nivîsandînê. Navê wê tekstê "Qewlê Zebuna Meysûre"³. Tekstek jî min di sala 1939 da jî zarê Eloyê Silo li gundê Tîselê

* Ev nivîs, di derheqa êzîdîyan de ji bo agahdariya xwendevanan, ji rojnama *Roj* hatiye girtin.

nahiya Axalkalakê komara Gûrcistanê nivîsiye, navê wê tekstê jî "Sure Efrîna Dunyayê ye". Her du tekst jî bi stran têne gotinê, fikir û kakile wan mîna fikir û kakilê herdu tekstên Anastas Marî û Şakîr, Fettah çapkirî: "Meshefa Reş" in. Li gellek ciyan ev tekstana mîna yên gellek girînge çî li mesele tarîxa dîn û diyanet û eydiyolojiya neteweyê Kurdan. Çî li meselên Zman û zaravên kurdan, çî li dîroka lêgerîna şaristaniya neteweyê kurdan. Heyîn û nebûna tekstê folklorî bi zaravê Kurmancî û tekstên Anastas Marî bi zaravê soranî nîşan dikin; ku ew tekstana bi fikir û kakil va nêzik hevin. Eger em têne li ser wê gotine, pêwîste em bêjin, ku diyaneta êzdiyan, dînê wan li nav Kurdîstanê belav kirî bû, ku êzdî heta niha jî li ser dînê bav û bapîrên xwe diçin, ku kurdên misulman bi zorbeyî û destê zorê wergeriyane li ser dînê misulmaniye.

Elîfbayê pertûkên dînê êzdiyan

Li paş wê got û bêje pêwîste çend giliyan jî derheqê elîfbayê pertûkên dînê êzdiyan binivîsim.

Di nivîsara xwe da min li cî-ciyân çend qise derheqa elîfbayê pertûkên dînê êzdiyan gotin. Niha jî ez dixwazim çend got û bêjan derheqa reng û rûyên wan, derheqa sîstem û prensîba pêkanîna wan binivîsim.

C. Lawkatka dî kitêba xwe da "pêşketîna nivîsarê" dî rûpele 135'an da dinivîse: "Elîfbayê êzîdî 33 tîpên zorbaya (piranya) xwe jî elîfbayê Nesturyaniye, têda çend tîpên xwerû hene; ew tîp jî şêxên êzdiyan zêde kirîne ku elîfbe, mînasibî zaravê tekstan be" bi fikra min eva gotina ne raste. Elîfbayê pertûkên dînê êzdiyan ne mîna elîfbayê Nesturyanî ye. Ew usan jî ne mîna elîfbayê Erebiye, ne jî mîna ye Yehudiye. Ew elîfbayê xwerû û neteweyiye. Belam pêwîste bê gotinê ku elîfba li ba îtâheta prensîp û sîstema elîfbayê Erebi hatine rêk û pêk kirinê (binere tabloya beramber kirina elîfbayan li jerê ye.)

Aşkeraye ku nivîsandin û xwendin bi elîfbayê Erebi, jî aliyê destê rastê dest pêdibe û ber bi aliyê destê çepê diçe. Nivîsandin û xwendina tekstên pertûkên dînê êzdiyan jî bi vî cûreyiye. Di elîfbayê Erebi da sê tîp bi kartînin, bo nîşankirina çend sewtên dengane. Di elîfbayê êzîdî de jî usane. Di her du elîfbayan da prensîb û sîstema nîşankirina sewtên dengani bi curekiye. Mesela tîpa (1) li destpêka xeberê (uşeyê-peyîvê) li nîve peyîvê û li kutaya peyîvê sewta dengani (a) nîşan dike. Ew tîpa bi reng û cûrê xwe va bi nivîsandina xwe va di elîfbaya Erebi da jî usan tê nivîsandinê. Di elîfbayê Erebi da tîpa du sewtên dengani (u,o) û du sewtên bê dengani (v,w) nîşan dike. Di elîfbayê êzdî de şûna vî tîpî tîpa (1) dinivîsin û ew tîp mîna tîpa sewtên dengani (u,û,o) û du sewtên bê dengani (V,W) nîşan dike. Di elîfbayê Erebi da bi arîkariya tîpa (y) sewtên dengani (ê,î) nîşan dikin. Di elîfbayê êzîdî da jî usaye. Di wî da bi arîkariya tîpa her du sewtên (î-ê) nîşan dikin. Di

elîfbayê Erebi da sewtên danganî kurt (î,e) di nivê peyîvan da nanivîsin (nîşan nakin). Li vira eyan dibe, ku prensîpa nîşankirina sewtên danganî di herdu elîfbayan da mîna hevîn, yan yeke. Eva qanuna û prensîpa usan jî li nîşankirina çend sewtên bêdengane da tê ber çavan.

Mesele di her du elîfbayan da bi arîkariya tîpekê sewta nîşan dike. Di elîfbayê êzidî da çar tîp zêde hene. Ev her çar tîp evîn: H,x,«,p. Ev tîpana sewta (Z) yê zmanê Kurdî nîşan dikin. Eyane, ku di elîfbayê Erebi da çar sewtên nêzikê hev hene; di zmanê kurdî de ev sewt tunîne.

Cewazî û cudatiya elîfbayan

Ev mesela jî nîşan dike ku elîfbayê êzidî bi prensîba pêkanîna elîfbayê Erebi hatiye danînê û çêkirinê. Yêkîtî û wekheviya prensîp û sistema pêkanîna elîfbayê êzidî û Erebi bi meseleyên dîn va jî tîn ber çavan û nîşan dikin, ku elîfbayê êzidî bin îtaheta elîfbayê Erebi daye. Lakin pêwîste bêjin, ku elîfbayê êzidî bi temamiya xweva jî elîfbayê ereb cewaztîre. Cewazî û cudatiya wî jî van elîfbayan di van meseleyên jêrin di aşkere dibe; Tîpên êzidî bi ferq û cewaz têne nivîsandinê. Di elîfbayê êzidî de nîşanên diya kirîtik (Nîqlîk û nîk) ne li ser tîpan hene, ne jî bin tîpan hene. Di elîfbayê Erebi da tîpên yek cûreyî bi arîkariya nîranên diya kirîtik jî hev cuda dikin. Mesela, nîşana (Z) bi diya kirîtik sewta (h) nîşan dike, bi niqtekê li ser (Z) sewta (x) nîşan dike, bi niqtekeki bin (Z) sewta (Ç) nîşan dike. Lê di elîfbayê êzidî de bi guhastina halê tîpan, sewtan jî hev cuda dikin, mesela, tîpa (Z) di elîfbayê êzidî da sewta bê danganî (t) nîşan dike. Lê di halê wergerên dî da li sewta danganî (ê) nîşan dike; tîpa (n) di elîfbayê êzidî de sewta (R) nîşan dike. Lê di halê wergerandî de (U) sewta (n) nîşan dike û êzidî da sewta (R) nîşan dike. Lê di halê wergerandî da (U) sewta (n) nîşan dike; di elîfbayê êzidî de tîpa (p) sewta bê danganî (z) nîşan dike, lê di halê paş û pêş wergerandî da e tîp (q) sewtên danganî (y,ê,i) nîşan dike. Di elîfbayê êzidî de tîpa (W) sewta (s) nîşan dike, lê di halê wergerandî da (m) sewta (Ş) nîşan dike. Xulase, prensîp û sistema nîşankirina sewtên di elîfbayê êzidî de jî gellek aliya va jî elîfbayê milletên cîran cewaztîre.

Cewaziya elîfbayê êzidî jî elîfbayê Erebi, Nesturyanî û yê Yehudî usan jî bi rêz û kêşen xwe rastva tê ber çavan. Tîpên elîfbayê êzidî bi rasterast rêzktirî û goşekirî têne nivîsandinê. Elîfbayê êzidî bi rêz kaşa xaxê nivîsandinê. Elîfbayê êzidî bi pêş kaşa xweva elîfbayê "Kivadrotiye", elîfbayê hunandî û çivane ye (çîmaneye). Bi lê nihêrin û lê hûrbûna xwe ez tême ser vê fikrê, ku elîfbayê êzidî bi destê merivê hozan, bilîmet û zana hatiye pêkanînê.

Bi destê wî merivî hatiye danîn û çêkirinê, yê kurind dîroka nivîsandîna elîfbayan zanibûye û karîbûye elîfbayê, teneweyî pek bîne. Ez li ser wê fikrê me ku Şêx Adî serekê şêxên êzidiyan ew elîfbaya pêkaniye û pertûkên dîn û ayîna êzidi-

yan nivîsiye. Bê şik meriv û mebestê wî ew bûye, ku wî xwestiye nîşan bike, ku dîn û diyanete Kurdên Êzîdî cudaye ku ayîn, dîn û diyaneta wan jî pûç bûne winda bûnê biparêze, ku peyvê wî li cem xwe bihêline, bixwenîn, ezber bizanîn. Vê teherê (bi vê cureyî) ew pertûkana heta niha jî gobekêkê (sîlsîlekê) ketiye destê gobekêkê din. Lê nebûye elîfbaye neteweyî. Ew elîfbaya nebûye elîfbaya neteweyî, ji ber ku berepêşin cem şêxên serekê û wek pertûkên pîroz nedane bi destê kesekî. Bi vê cûreyî ew pertûk di nav komên şêxên Êzîdîyan de maye û belav ne bûye.

Dîtîn û xwendîna Pertûken Êzîdîyan .

Eyane, ku dîn û ayîna misulmaniye bi zora şûr di nav Kurdên Êzîdî de belav bûye. Êzîdî mecbûr bûn ku xawle û nepenî (pena) bijîn. Sebebê vê yekê elîfbayê kitêbên dîne wan nebû elîfbayê neteweyî ye. Ji ber vê yekê jî ew elîfba danîne "elîfbayê siri" û navên pertûken dîne Êzîdîyan jî danîne "pertûkên siri". Di rojhelatnasiyê de ev nav li wan kirine. Lê bi fikra min eva neraste. Ji ber ku dîroka peydabûna elîfbayên milletên din li paşê hêdî-hêdî ew elîfba belavbûye û bûye elîfbayê neteweyî. Çend qisan jî bêjim çawan pertûken dîne Êzîdîyan hatîbûn dîtîne û xwendîne.

Anastas Marî, yê ku pertûk dîtîbû û dabû Detnêrê Îrannas ku ew wan bixwîne di pêşiya tekstan de kitêba Antropor da dinivîse: Lî çiyayê Sîncarê li kitêbxana Lalêşe li senduqekî hesinkirî min dîtîn, kilîta wê senduqe li cem serekê şêxên Êzîdîyan bu, her bi îzna wî nobedare kitêbxanê derê senduqê vedike. Pertûkên dîne Êzîdîyan di gel kitêbên Yunanî, Asûrî û Erebî qedîm vaşartîbûn⁵. Anastas Marî nabêje çawan ewî ew pertûk ji senduqê derxistin? Kê da wî? yan jî wî çawan reşê wan jî ber girtî? Ev pirsana ne eyane û ew ewqas jî ne mihîmin. Pîrsa giring ewe ku ewî ew pertûk dîtîn û dane Betnêr, ku bixwîne û tercûme bike. Betnêr ew pertûk xwendin û wergerand. Bi fikra min ev yeka miyaserbûye (hatiye serî) bi du cûra: Yan ew bi xwe bi arîkariya zanîna xwe-zanîna zmanan û elîfbayan evî ew pertûk xwendin û tercûme kirin; yan jî wexte Anastas Marî ew pertûk dîtîn, ew li ba şêxên serekên Êzîdîyan hînî elîfbayê Êzîdî bûbû û ji Betnê Betnêr ra gotiye. Bersîva pîrsa xwendîna pertûkên dîne Êzîdî eve.

Dîtîn (Dozîneweya) wan, çapkirin û wergerandîna wan pîrseke gellek ferç û giringe di lêgerîna dîroka şaristaniya neteweyê da.

Hata niha em dikarin her tenê li babet van pertukan binivîsin. Dibe pertûkên din jî yên ayîn û diyaneta Êzîdîyan li cem şêxên Êzîdîyan hebin. Bêşik ew pertuk hene, mesele li nav Êzîdîyên Sovyetîstanê dibêjin ku "Zebîn" û "Mişur" hene, şêx wana nîşanî kesekî nakin, veşartînekî nivîsara pîroz.

Bi nivîsara Layard em pêdîhesin ku kitêbên Êzîdîyan arzî hebûne. Mesele ew di kitêba xwe da "Discoveries in Nineweh and Babilon". London sala 1853, rupe-

lê 92 dinivîse:

“Rojekê sibê Qewal Yusif bi katibê şêx nasva cildê kitêbekî anî nîşanî min kir çawan ez pê hesiyam katib dikarîbû wê kitêbê bixwîne. Di wê kitêbê da çend laperên berê kevin hebûn. Di wan laperanda beyta şêx Adî hebu ruhberan li rû dunyaye”.

Lçyard wê beytê werdigerîne li ser Ingîlîzî. Lê sed mixabin tekstê kurdî yê wê beytê çap nekiriye. Li paş tercûma xwe ya beyta şêx Adî layard disan dinivîse: “Berê gellek pertûk, kitêbên êzidiyan hebûne, lê ew kitêb û pertûkana di şeran de winda bûne, yan jî hatîne şewitandinê” Derheqa wê yekê da ew gotina Qewal Yusif tîne bîra xwe. Ew dinivîse: “Qewal Yusif gotî min ku berê kitêbên êzidiyan arzî hebûn, wextê Mîrê Rewunduzê êrişî li ser êzidiyan kir ew kitêb û pertûk windabûn û şewitîn; ewî bi babet babeta dayî bi min, got ku têde qanuna ayîn û dînê êzidiyan heye, reşê vê li baranê heye, bi gotina Qowal Yusif dunanhiya beyta kumîn tercume kiriye li ”kitêba teselyeta feqîra di heye”⁶. Meselên jorê nîşan dikin, ku pertûk û defterên êzidiyan gellek hebûne, lê bere-bere di nav şerê musulman û êzidiyan da winda bûne yan jî hatine şewitandinê. Di sala 1837, wexte ser eskerê Romê, Reşid Paşa bi eskerê xwe va hate ser êzidiyan, gellek gund xirab kirin, jin û mêr çîrkerin, talan birin, ziyaret herimandin, Tavus birin, jin û zaro ji hesîr birin.

Gellek şerên awa li êzidiyan qewomîne. Roger Lescot di kitêba xwe da gellek meselan tîne ber çawan ku ser askerê Romê zefkar, axa, beg û derebegê surmanan êrişî li ser êzidiyan kirine, gund xirab kirine, jin û mêr kuştine, talan birine û ziyaretên êzidiyan ruxandine. Lê pêwîste disan bêjin, ku Kurdên êzidî heta niha mane, xwendine, kitêb û defteran de hatiye nivîsandin. Û helbet li cem şêxan, li cem mezinên êzidiyan mane. Kî dizane, dibe rojekê ew kitêb û pertûk bikevine destê zanan û de bêne hêgehîne têde bê ber çawan Yekîtiya ayîn, diyanet zman û dîroka Kurdên êzidî û kurdên surman⁷. Di kutayê da divêt bêjim, ku berheviya gotin û nivîsandîna ev got û bêjên jêrinin:

1- Pertûkên dîn û ayîna êzidiyan, Anastar Marî dîtin û bi arîkariya Betnêrê Irannas hatine çapkirinê, bi destê Şêx Adî serokê şêxên êzidiyan.

2- Ew pertûkana bi Soranî elîfbayê xwerû, serbixwe û neteweyî hatne nivîsandinê; bi serhatiyên bi edetiyên şêxên êzidiyan û bi nivîsana zanayan tê îspat kirinê, ku nivîskarê wan Adî bûye.

3) Bi êgerên wan pertûkan em pê dihesîn û têne ser wê fikîrê ku heta sedsaliya 11-12 Kurdê soran, yên nahîya Merîvanê li ser dîn, diyanet û ayîna bav û bapîrên xwe bûne, yan jî peyverên dînê êzidî bûne.

4- Li paş parça nivîsa li ser postê, ku li nahîya Suleymaniyê hatiye dîtin⁸. Em dikarin bêjin ku pertûkên dînê êzidiyan heykela literetura duyemîn ku bi zarave

soranî (Kurmanciya jêrin) nivîsîne.

5- Eva heykela nivîsandî gellek û gellek giranbihaye, qîmet û nirxê wî gelege nek bi tenê li babeta lêgerîna ayîn, dîn û diyaneta neteweyê me, usan jî li babeta lêgerîna dîroka paşketina zman û lîteratora me neteweyîye.

JÊRE NOT

- 1- Roger Lesco, Enqutte sur les yezîdîn, Beyrout 1938, pp 32-44
- 2- Binêre: Roger lescot, Kitêba wî navgotî rupelê 32-44
- 3- K.A. Rosvert, Mîr nişînên musulmanetiyê, Mosko, 1971, rûpelê 30
- 4- Binêre fonda wêjeyê ya entîkxana wêjevanîyê û hureriyê, Yerîvan, fonda 10, Lazo
- 5- Binêre, Govara Antropos, bergê 6, wiyen. 1911
- 6- Binêre, kitêba Layard ya navgotî, rûpelê 9192
- 7- Binêre kitêba Roger Lescot ya navgotî, rupela 101-128
- 8- Binêre Reşîd Ynamî, Kurd û pêwîstîkî nijadî û tarîx aw, Tehran 1946, rûpelê 118-120. Binêre usan jî mîhemed Bihaddîn pîrê salyar Zerdestî. Bexdad 1968, rûpelê 8-9

Zilamek û Zimanek*

HEREKOL AZÎZAN

Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne. Herwekî emê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanên zindî, nav wan zimanên ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê êşkere dikin.

Me got zimanên mirî û zimanên zindî. Bêdiro, ji awîrê jiyînbariyê ve ziman ji wek mirovan û wek her heybera zihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordûnde diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kêl ne kitêb. Hinên din di pey xw ere eserine mezin, kêtibine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî îro jî têne xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ko êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Li Ewropayê latînî, li rohelatê nîzing ibranî zimanine mirî bûn. Latînî îro jî zimanekî mirî ye. Lê herçî ibranî êdî ne zimanekî mirî, lêbelê zimanekî zindî ye.

Belê ew mirovê bîvên di nav cihyan de derket û zimanê ibranî vejand. Ibrani zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanîn û di kaniştan de Tewrat bi vî zimanî dihate xwendin.

Herçî cihî bi zimanine din, bi zimanên welatên ko tê de rûdiniştin xeber didan. Yanî cihyan zimanekî milî, zimanekî xweser nûn bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan.

Di sala 1877-an di şerê Ūris û Tirkî de zora Tirkan çû bû û herî miletên Belqanê hene ji bindestiya Tirkan xelas bû bûn. Xelaskirina dewletên Belqanê nema-ze bi destê çarê Ūris çû bû serî û miletê Ūris bi xwe bi vê îşî bendewar dibû û roj-nameyên Rûsî gelek qala dewletên Belqanê ên nû dikir.

Di welatê Ūris de xortekî cihî bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû. Kurê Yehûda wek herkesî bi vî şerî bendewar dibû û didît ko miletên bindest wek Sîrbistan û Bîrxaristanê û ên mayîn ji nîrê zorkerên xwe xelas dibûn û digihaştin istîqlalên xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hişyar dibû û liber halê miletê xwe diket. Yehûda didît ko halê miletê wî ji halê her miletê din xirabtir e. Cihî ne bi te-

* Ev nivîs, ji kovara *HAWAR*, hejmara 40'an hatiye girtin. Ji bo agahdariya xwendevanên *WAR*'ê. Herekol *AZÎZAN*, jek ji navên Celadet *BEDIRXAN* e.

nê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê wan jî nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihî qerara xwe da û di dilê xwe de got: Divêt cihî vegerin welatê pêşiyên xwe, welatê kurên Israîl, û dîsan divêt ko cihiyên jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin. Ew ziman jî zimanê pêşiyên, zimanê ibranî ye.

Yehûda hînî zimanê xwe bû û di sala 1878-an de qesta Parîsê, qesta wî bajarê mêvanhewîn kir.

Li Parîsê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihiyên Parîsê bû. Elyêzer jî alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fikrên xwe ên milî belav dikirin. Lê welatîyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ew mirov dîn e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera a xwe mezin re bi vênêke xurt û mezin û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kiri bû serê xwe û miletê xwe ê bêziman, miletêkî biziman bîne pê.

Yehûda bi xwe hînî zimanê xwe, hînî ibranîyê bû bû. Niho diviya bû ibranîyê di nav civata miletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881ê de Elyêzer keça mamosteyê xwe xwe re anî û berê xwe da Felestinê. Bi vî awayî jinîkek, hîmê xanimanekê, keti bû destê. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rê ve, di vaporê de dersa jina xwe got û hetanî ko haştine erdê Felestinê jina wî hînî çend piran ibranî bû bû.

Gava pê li erda pêşiyên kirin Yehûda gote jina xwe, ji niho û pê de emê bi tenê ibranî xeber bidin. Ibraniya jinîkê gelek hindik bû. Jinîkê kir ne kir lê mêrê wê ji qerara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye ko zaroyên Yehûda hetanî ko bûne xort ji ibranîyê pê ve bi tu zimanî ne dizanîn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesêb. Lê bi vî laliyê miletê cihî wek miletine din bû xwediyê zimanekî, xwediyê zimanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zîvariyê de dijîn. Lê çî xem. Ji fikirine mezin re fedakarîne mezin divêtin. Ji ber ko xelk bi derbekê bîra fikira mezin nabe. Yehûda nanê tîsî dixwar lê gava didît ko xelkê mala wî bi ibranî xeber dida, bawer bikin, xwe bextiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi ibranî belav kir û ji xwe re xwendevan jî peyda kirin. Bi rê va û di hin dibistanên cihî de dest bi xwendina ibranîyê jî kirin.

Ji milê din Yehûda ferhanga miletê xwe çêdikir û bêjeyên ko di zimnekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanîn. Zimanê ibranî jî di nav cihiyên de belav dibû. Di sala 1922-an de gava Elyêzer bin Yehûda mir zimanê ibranî yê ko berî 30-40 salî zimanekî mirî bû, bû bû zimanê miletêkî. Ev ziman îro di Felestinê û di rex erebî û inglîzîyê de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ko bi vîna zilamekî têtê pê. Di kar û biserhatiya vî zilemî de pend û derseke mezin heye. Herçî miletên bindest bêziman an bê zimanê nivîskî divêt jê ibretê bgirin. Herçî em kurd, me ziman, me zi-

manekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vê zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletî êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfe ranebûne wezîfa xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî miletê xwe ne hatîne. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bihesibîne divet bi kêrî wî bêt.

Piştî ko em kurd jî wek miletên din bûne xwediyê elfabeke xweser, xwendin û nivîsandina zimanê me gelek hêsanî bûye. Tecrîbê şanî daye ko li gora jîriya mirov kurd jî heftêkê heta çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin.

Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanê awe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derve be bi tenê bi kurdî dipeyivin. Lê di nav kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahiyê an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê ko ji vê hindikahiyê re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin berî ewilî hînî wî bibin û piştê di nav mala xwe û bi zar û zêçên xwe re herwekî Elyêzer dikir bi tenê bi kurdî xeber bidin.

Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve têne mal, herwekî cilên xwe ji xwe di-kin û wan bi cilên malê diguhêrinin, zimmê xwe jî welê biguhêrinin û bi zimanê kûçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştêkî miqedes hilînin.

Hinek bîr û babetên nû...

Derbara Kelepora Bajarvaniya Kurdî de, Xirvekirina Keleporî û Rizgarkirina wî ji nemanê - I

EBDURREQÎB YÛSIF

Wergêr: M. Xalid Sadîni

Peyva “Kelepor” ku bi erebî dibêjinê “el-Mîras” tev wan babetan digirit ku ji bav û bapîran mayin bo neviyan û bo milletî. Mîna; dîrokê, toreyê, rengên hunerî, û sin’et û şûnwaran (asar) û dab û nerîtan û çîrok û hikayet û efsanan. Milletên pêşkeftî ji zû pûte bi komkirin û saxirna keleporê bajarvaniya xwe daye, çinkî binaxê netewatiya milletî di bestît digel demê raboriyê xweve û millet bi keleporê xwe, xwe dinasit û nişana piçkdarîkirinê ye, di avakirina bajarvaniya mirovî li ser rûyê zeviyê...

Milletê kelepor nebit wê bê binaxe ye, wek xaniyekê bê binaxe (esas) û yan wek Kak Hesenê Heme Sorê Dibaxçî li Silêmaniyê gotî: “Kelepor tapu we... Tapuwa milletî ye.” Me rewşenbîrên kurdan heta niha putepêkirneka hosa nedaye bi komkirin û saxkirina keleporê bajarvaniya xwe... Belkî mişe ji me li hawîr şî’ir û çîrokê dizivirin yan bêjin li hawîr wan kom bûne û layên di ên keleporê me bê xwedan mayine û pitir jê wê ji nêv biçit û ewê mayî ji roj bi roj wê ji nêv biçit. Niha keleporê Kurdî wê perş û belave dibin kujyên (qulaçên) tekya û mizgeft û paşve-mayên kevnên pertûkxanên şêx û melayan ve û li gundan û li ser singê piran û li nêv taxên kevnên bajaran de wek: xaniyên nexşinkirî û ew xanuyên nimune bo hinerê mîmarê kurdî. Her wesa keleporê bajarvaniya me jê belave di nêv qeyserî û xan û germavên ku vinde û di nêv şkevt û aşgeh (kela) û suran de. Ev keleporê wê belave bê xwedane, pêdvî têkoşîna bi dehan belkî bi sedan rewşenbîrên dilsoj û çeleng heye. Pêdvî bi zûtirîn dem vêra bigehîn û ne her mijûlên parçe şî’ir û parçe çîrokên xwebîn. Bila bizanin em tev berpîrsiyar in di beramber windabûna dîrokê de. Di çaxê dahatû de wê hesabeka tîjtir digel me biketin.

Hinek ta û babet ji kelepor û rewşenbîriya me heta niha di tariyatîyê de mayine. Ne rewşenbîran û ne dam û dezgehên rewşenbîriya kurdî bîr lê hatiye. Bo nimûne: Belgenamêyî (wesaîqan), belgenome (wesîqe) çi ye? Hinek kes we dizanin Belgenome pêkhatiye ji nama padişahê û yan fermana sultanekî derbara wez’ê (rewşa) siyâsî û bûyereka dîrokî û yan karek girîng. Belekî wesîqe ew tişt e ku zanariyekê digirt ku bi mifayê dîrok û behsê vekolanê dihêt, mîna nivîsanê... Çi li

ser kaxez û qora morkirî, çi li ser ber û dara yan tiştêkê kanzayî (madenî) û yan her tiştêkê dî bit. Ew nivîsan jî çi nivîsaneka resmî ya hikumetê bit, çi fermanrewa mîrekê bit. Yan jî teştêkî din mîna nameyên di navbera zanayan û zelumên navdar û xelkê dî bit. Mişê caran nama derwêşekî yan yabê desthelatekî giringtir e ji ya mîrekî.

Herwisa ji keleporê wesaîqî ne... Îcaza melatîyê û xelîfayetiye şecera binemalan mîna seyîdan û yê hinek binemalên êzîdîyan ku bi "Mişewran" bi nav in, bi taybetî wan şecerên mor û înzayên xelkî li ser mîna govayan (şahid). Li ser diris-tiya şecerê, wek mor û îmza; qazî, miftî, xetîbî û muderrîsî û neqîb û mirovên dî ên dînî û hinek ji van şecerên pir biha niha mane û hineka jî nêzîkî 70 mor îmza li ser in. Pêdvîyê zû nîxan li ber bigirin û biparêzin. Li dîrok û arêşên dîroka kur-dî nîn e. Ez jî hez dikim nimûnekê bi wî tiştî bînim ku ji layê zorbeyî rewşenbîrên me qe çinine. Dîroknivîs gelek pêdvî van şeceran dibin û hinek lengiyên dîrokî pê rast dikin. Bo nimûne: şecera seyîdên Şabedînê Bakurî. Di havîna 1982 yê wekî min zanî ez çûme Qelaçolan û digel Şêx Cemîl û Şêx Sedîqê Şabedînê, me îna û 8 li ser dane girtin. Li dûmahîya mîrnivîsîna Baban de ev şecere bi xetek ciwan û nû nivîsaye. Dirêjî 2 r 75 m, yanî 5 r. 21 sîm 9 19 mor li ser in. Mîna mora: Mela Ebdurrehmanê Modîsî, miftîyê Suleymanîyê ku ji zanayên bi nav û dengên çaxê xwe bû. Şêx Hisênê qazîyê Suleymanîyê û Ebdulsemedê Qazîyê Suleymanîyê ku mora li ser hinek wesaîqên çaxê Babaniyan daye. Piştî hingê dê binê mora Seyid Ehmedê Neqîb, Mela Mehmûdê Tekiyeyî, Mela Ehmedê xetîbê Suleymanîyê, Seyid Mehmûdê Berzencî, yê Muderis Seyid Hesenê Kurê Seyid Qadirê Ewdelanî, Kak Ehmedê Şexî û hinek kesên di jî. Şêx Mehmûdê nemir jî îmza kiriye, hêja Şêx Mehemedê Xal ji zanayên bi navên me ên evro ye û gelekî şarezaye di nivîsaneka xwe da nivîsaye: "Di sala 1280 da Şêx Hesen bûbû qazîyê Silêmanîyê." Belê bi vê şecerê derket ku şeş salan berî hingê qazîyê Suleymanîyê bû. Çinkî li roja "23 ê (...)" 1264 Koçirî (K) = 1847-48ê Zayînî (Z) da mora xwe ya lê dayî û ya nivîsaya: "es-Seyyîd el-Qazî Bi-Hurusel - Suleymanîyye." Min ev rastîyê da seyda "Şêx Mehmudê Xal, gelek pê keyfxweş bû. Şêx Hesenê Qazî ji şa'ir û zana bûye û hinek dibêjin wazî'ê pexşa kurdî ye bi zaravê kurmanicîya xwarê.

Mişê ji wan kaxez û nivîsan ku xelkî mîfayê wan nezaniye, yê di havêtin û sotîn. Belgenome gelek di girîng bûn lê di destên nezanan da bûn. Mîna mesela wê dora salên heftêyan de li Pêçune li Qelakiçê de înayê der û nezani bo çi ye û îraniyan bi çend dînarekan jê stand û bi niv milyon Tumena firete Ewrupîyan.

Dûr nîne mişê kes bêjin: "Erê kaxezeka diryayî derbara cî avekê yan karêzekê û yan aşekê û yan germavekê û yan xanek û debaxaneyekê çi biha heye? Ev kes nîzanin ev renga kaxeze wesaîqên dîroka aborî ne. "et-Tarîx ûl İqtîsadi" (Dîroka Aborî) di Kurdistanê de û mîfayê wan wê zor e. Bo nimûne: Seneda aşekî li gundê Bostan Sor li Şarezorê kete dest me. Wekî hûr berê xwe di demê, dê bibe bel-

gename bo gelek babetên cuda cuda: Babetê rengê rêkxista senedên kurrîn û firo-tina milkî li Kurdistanê. Bo mewzu'ê mîratî, bo mewzu'ê bazirganiyê û ew pere di kurrîn û firotinê de hatî bikarînan di çaxê Babaniyan de. Çinkî di vê destxetê de îbareta "Tuman neqd miskokey Suleymaniye" hatiye. Diyar e mexsed pê ew e; ew tîmen di bazara Suleymaniyê de wê bi rewç bû. Yanî ne li Suleymaniyê zerb kiriye, çinkî kes nabêjît Babaniyan pere yê derêxistin, mîna mîrên Kurmancên Bid-lîsê, Rewandûzê, Cizîra Botan ku heta niha jî perê hinekan di mûzexanên Îstan-bul û London hene. Wek perê Mîr Şerefê Bidlîsî û Mîr Avdel (Ebdullahê) Mîrê Ci-zîra Botan. Dûr nîne ew mîr Avdel bit ku niha navê wî li ser we hucrêye ewa li ser gorê "Mem û Zîn a" avakirî, di xundegeha "Mîr Avdel" de li bajarê Cizîra Botan.

Her wesa ev seneda "Aşê Qere Welî Beg"ê Bostansorî Şarezorî, belge bo vê çendê Şêx Resûlê kurê Berzencî ku bi Şêx Resûlê Pilawxwer hatibû niyasîn, di çaxê Suleyman Paşayê kurê Ebdurrehman Paşayê Baban de neviyê Seyîdan bû (Neqîb-û-sadat). Çinkî di senedê de wesif kiriye "Neqîbul Eşraf" ku çî kesan ev nezaniye. Hosa seneda aşî Cengiyekê ji dîroka baban dirust diket. Ku dîroknivîsan gotiye ye-kemîn kesê bûye neqîb li Suleymaniye, Seyid Mehmudê kurê Seyid me'rufê kurê Şêx Senê Gelezede'yî ye û wezîfê (neqabat) di binemala wan de maye, ta Şêx Mis-tefayê neviyê Kak Ehmedê Şexî bûye neqîb.

Her wesa seneda aşê Welî Begê dibite belge bo vê çendê... Caran lengî, berhingari wesîqan dibit û pêdvîyê dîroknivîs agehdarî vê xalê bit bo nimûne dîroka vê wesîqê yanî seneda aşê bi lengî nivîsaye "1225 Z" şûna 1252 K = 1837 Z. Her wesa dibit belge ku Ebdussemed kurê Seyîd Elî di pêş Hisênê Qazî wê bûye Qaziyê Suleymaniyê. Çinkî ev senedê "tesdîq" kirye, Xasimê mor û nav li ser in. Dîsan ji dadgeha şer'ê Suleymaniyê derçûye. Her wekî mora naibê qazî Ebdulhekîm li ser e digel nav û mora çend kesên di.

Her wesa bi rengê mora qazî û rengê nivîsana wî de zanî ku ev e ew "Ebdulse-med" nîn e, ew e li sala siyê ji avakirina Suleymaniyê de qazî. Nav û mor li ser bel-genemeyê kêye digel îmza û mora Birahîm Paşayê Baban. Yanî du kes bi navê Eb-dulsemed" î buyine qaziyên Suleymaniyê. Hosa bo me xwiya dibit ku seneda vî aşî bi mefay e. Bo vekolana dîroka dadgehan di çaxê fermanrewaya sê kesan jî bine-mala Zulal Axa"yê di senedê de hatiye ew binemala ku yek ji "dewazde suwarên Merîwan" jê rabûyin, digel navê çend jin û zelaman ji binemala "Qere Welî Beg"ê. Eva me gotî hindek bo ji mîfayê senedeka nivîsvan û rewşenbîrên her ne di hel-girt û dibêjin: "Kaxezeka diriyayê derbara seneda aşekî dîr nîne berên wî jî nema-bin û mîfayê wî çiyê?

Vêca hêvî dikeyn ji wan kesan yê ev renga kaxezene li cem hebin, nehavêjin. Eger nevyan jî bila teslîmî pertukxaneka giştî bikin, di bajêran de yan muzexane-kî yan jî danêrekî kurd.

Mixabin ji ber paşveman û nezanîna behayê kelepore wesaiqî û ji ber nebûna

“weîye”* yê bi dehan belkî bi hezaran wesaiqên me havêtin yan sotin. Di van nêzikan de li Suleymaniyê û Dewropistan, bo nimûne; di sala 1976 de ji kurên Kerîmê Fetah Begê Hemewendê bînav deng, tenekeka wesaiqên babê xwe li bajarê Çemçemalê digel xwelyê havêtin ku bi dehan kaxezên zelamên mezin mîna kaxezên Şêx Mehmudê nemir di nêv de bû, sê çar kaxezên Mistefa Kemal û Ozdemîrî jî di nêv de hebûn.

Ez li havîna 1982ê çûme Çemçemal bi niyaza destxistina tiştêkî ji wesaiqên Kerîm Begî, wergirtina zanyariyan ji wan pîremêran wê digel da jiyayîn û dîsan çûme layê wî bi vê karî rabuyî û min gazin de jê kirin. Gote min: “Ezê gunehbar nîn im, çûnkî tu wê dibînî ez zelamekê kore û bêjin û mal im ne, xwendewar im û min got ev kaxeze wê di kevin bûyin bi mifayê çî nahên. Lê guneh li ser milê rewşenbîran e, bo çî heta niha ne dihatine cem min û gitibane ev tiştêk bi mefaye heta min ne havêtibane.” Erê bi rojê çen şair û çiroknivîs bi vî bajarî de dihên û diçin?

Di sala 1979 de Şêx Mehmedê Kurê Şêx Ferecî yanî binok yek bahola zila tijî ji kaxezên bavê xwe li Seyîd Sadiq sotin ku bi dehan namên “Risail” vî û wî têda bûn. Mîna namên Ingilîzan û Mehmed Xanê Dizlî û Şêx Mehmudî. Heta yek ji namên Şêxî bi şîira xwe bûye di menfayê de bo hinartiye û gazinda ji Şêx Ferecî dikêtu ku serekî lê nadet. Şêxî di pêş gotina xwe da nivîsaye: “Sîrî ser berde lê îro be nîmet gep ekey...” Şêx Ferecî jî gote: “Qanî”ê hozanvan bi şîerê bersîva Şêxî bide. Wî jî bi hozanka nebelavkirî bersîva Şêxî hinart. Şêx Ferecî gelekê zîrek bû digel Şêx Mehmudî pişkdarbûye di şerê dijî Urîsan de. Li Pencûnê, Banê û Seqîz. Cihê l’îmadada Şêxî bûye, ez wekî çûm Seyîd Sadiq min gazinde ji Şêx Mehmudê Şêx Ferecî kir, ewî jî bersîva min mîna bersîva kurê Kerîmê Fetah Begî da.

Her di wê salê de yekê jina wî ji binemala Elekeyê li bajarê Suleymaniyê zû tirimpelên pir ji ewraqên Xwadê jê razî. Ebdulkerîm Elekeyî ku di odeka taybetî de bûn derêxistin û li tabîê Şêx Mehmudî gerya û piştî hengê vêkra havêtine çemê Qalyasan... Her wekî di meha borî de devê xwe gotî min ev ewraqê ne niha jî çendek jê mane û pirtir jî yên bazirganiyê ne. Bo dîrok û vekolana barê bazirganiyê di salên bîstan de gelek bi biha bûn.

Di sala 1982ê neviyên Ehmed Faîzê Berzencî xwedanê pertûka “Kenzul Lisîn” e’cîb, çar bermilên pirî ji paşmayên pertukaxana, li nêzîkî Seraya Suleymaniyê kenaran digel xwelyê havêtin. Her wekî çawa dû trimbêl ji ewraqên belav û pertûkên destnivîs paşvemaşayên pertukxana Babaniyan di nêv mizgefta mezin de ma bûn, sala borî mezgeft te’mir kir, tev havêtine ji derveyî bajarî. Bê yek bêjît ev paşvemaşayên pertukaxana fermanrewayên Kurd bihêlin heta mişe wesaiqan jî rizgar bikin. Di sala borî da tiştêk mezintir rû da ew jî daîreka mezin li Suleymaniyê li dorên çar tene ewraqên xwe ên kevnên çaxê Osmanlî û Ingilîzî û Şêx Mehmudî li ser pira Tancero sotin, bi hezaran wesaiqên girîng di nêv de hebûn derbara şol û karê vê bajarî. Her wekî di van salên borî da pitir ji daîran ketne sotina ewraqên

kevin di danana dewleta nû ya Îraqî ku “Qanun Etlaf er-Resîme” bi her rengê bit dîsan sotin û ji nav birna ewraqên wesaiqên daîran qedexekirin bi tenê rê da sotina ew ewraqên di bê mifa li dûv “Qanun Hifzil Wesaiq”. Di sala 1983 ê her yekî wesaiqekê ji nav bibit, ê 10 hezar dînanan ceza bikin. Lê pitir ji wan kesên endam di lijna sotina ewraqên daîran de çi we’î û zanîn derbara wesaiqan li cem nîne û çi jî bihayê wan nizanin, her wesa xwe nawestînin bi ciwanîya ewraqên wesaiqî û ji hev cudaken, tev vêkre sotin. Bi rastî gunehbariyek mezin dikin derbara mafê dîrokê û keleşorê milletî, xasime dijî yasayêne.

Ewraqên daîran gelek girîngin, çînkî tev şol û karê welat li nêv dîyare pitir ji yan sêka wan wesaiqan di girîng in û divê ji nav nebîn. Hêvîdarin ji mela û فرمانberan li bihayê wesaiqan bigirin çi ewraqên dî ên bi mifane soj in.

Mixabin nezanîn bûye egera sotina bi dehan komelên wesaiqên gelek bi biha. Heta nebûna We’îyê di nêv wan kesan de ku bi rewşenbîran dihijmêrin gehîştîye wî radî ku yek rêvebirên perwerdeya Suleymaniyê komelekê ewraqên bavê xwo bisojit. Pitir jî di çaxê Osmanî û Babaniyan de bûn. Mişe wesaiqên pir biha di nav de bûn, bavê wî Mela û morhelken bû. Hez ji dest nivîsên kevn û ciwan dikir. Mişe tiştên berketî komkirin e û xasime mirovek bijûn bûye û zîvê qaziyatiyê ji “Mêcir Sonî” wernegirtiye, roja 27. 05. 1982 ê ez û kak Ekremê Salihê Reşeke ku dilsozek keleşoriye, çûne mala wî kesî. Gote me: “Min tev sotine. Çînkî gelek bûn, çaxê pêdvî tapuwekê dibûm, divê gelek lê geryabam di nêv wan ewraqan de, vêca min got ezê bisojim xwe ji vê sergêjiyê derbas bikim.”

Bêguman em tev berpisyarin di beramberê vê xusaretiya mezin bi keleşorê me ketî, çînkî em nikarinê weîyekê di nêv xelkê de belkî di nêv xwe jî de belav bikin. Di vî barî de, divê xwe ji vê hizra berteng derbêxin û bikevin di komkirin û saxkirina keleşorê wesaiqî. Xasime eve karê du kesan nîn e, belkî divê di her deverekê de hinek kes hebin vê bikin. Di sala 1982ê vê karesatê wê rû dayî, min nameka dirêj nivîsabû “El Merkezêtul-Vetenîyyetul Wesaiq” Min ev rastiye bo derêxist û min gazind jê kirin û ku divya weîyek di nêv xelkê de belavkirbaye, heta ev hemî wesiqene ji nav neçin û dîsa min daxwaz jê kir ku bernameki li ser vî bareyî bi kurdî li televizyona Kerkûkê de belav bikin, her wesa divê çend tayekên nav xweyî vekin li çend bajêrgehan bo komkirina vê keleşorî da dîrok nivîs bi sanahî mifayî ji wesaiqan werbigirin. Ne ku her divê wesaiq li Bexda bin. Her çende nama min wa tij bû û min çi niyasînî digel “El Merkezê tul Wetenîyyetul Wesaiq” nebû. Lê dilsozî û giyanê zanistiyê Seyda Sam el-Alusî emîndarê “MWW” û “Emînê A’m el-Fer’î-l-iqlîmî - el-Erebiyye Lil-Wesaiq” bû û nama min digel bersîva xwe bû, min da rojnama “el-Iraq” di hejmara 12. 3. 1983ê li jê nav û nişanên “et-Tirasil Wesaiqî el Metqud fi Mentîqe-tul- El-Hukmi-z-Zatî” bû, hindê da ev rastiye, derbara li nav çûna bi hezaran wesaiqan bikevîte ber çavên rewşenbîran û peydabûna we’îyekê... “MWW” di bersîva min da nivîsaye ku bernameki de di televizyo-

na Kerkûkê de belav kin, dîsan dê tayan li bajêrgehane vekin û di van rojan de mîna "Mezkure" ka 12 rûpel da MWW û kura zanyariya kurd û emaneta giştîya rewşenbîrî û lawan û xwandina kurdî û dezgehên rewşenbîrî û belavkirina kurdî bo hindê layekî li emanetê vekin. Ger nevekin ewê mayî jî wê jî nêv biçit. Çinkî kes jî karê xwe yê taybetî jî şîr û çîroka xwe bernadet û xwe nakete xwîdanê vê keleporê bi seng. Bêguman mişe name jî bo rewşenbîran hinartine her divî barî de.

HUNERÊ BÎNASAZÊ KURD

Yek ji wan çivên tayiyên keleporê me, ku rewşenbîr û dam û dezgehên rewşenbîriya me bîr lê nehatî "Hunerê Mîmarî" ye. Çi millet heta niha nînin bêxanî heta li çolê jî bijîn, ew xaniyên bo xwe diristkirin çî ciwan û çî kirêt pêkhatine ji hunerê mîmarê wî milletî. Ev hunere jî çiveke jî keleporê bajarvaniya her milletekî, kurd jî "kela-Asegeh" û Şûrhe û gund û bajar ava kirne ku xwodîke bo hunerê Mîmarî xwe der nîne, jî layê hinek kesan ve tiştê seyr bit ger bêjin: "Bo yekemîn car hunerê mîmarî di dîroka mirovan û tevaya cîhanê de li Kurdistanê pîroz diyar bûye. Zanist û şûnwar derêxistine ku bû yekemîn car fêrî avakirina xaniyan bûye. Li gundê "Çermo" li nêzîk Çemcemal û paşî berev Mendelî û naverast û jêriya Îraqê kêşa. Bo nimûne hêvke pertûka Şerîf Yûsif (Tarîxul Îmaretil Îraqîyye fi Mextelif-î-Îsar" dê bîni wek qeyseriya neqîb û xanên sotî û germava suret li Sulaymaniyê. Her wesa wan xanên li tenişt germava miftî hostayê mezin. Hosta Elî û hosta Hesênê Fatîme xezaye dirust kiriye û niha jî sax e. Her wesa qeyseriya nû û xana Mehmûda xayê û îhsara kevin li Koysinceqê û xana Seyid Nureddîn û xana Gawiran li Kerkûkê û minara sultan Muzeffer û hinek jî xanên Kelayî û xanên E'taullah axayî ku hosta Eliyê Hevlêrî li Hevlêrê avakiriye û Pira Delal li Zoxo û Telara Qesir Elî Begî Mîrê Êzidiyan li gundî Bae'durê û Laleşê qiblegeha êzidiyan rengê mîmarê bilind heye bi taybetî kolanên bankirî mîna qeyseriyan, belê kolanin ne qeyserî ne. Eve jî diyar diket xerîbe di hunerê mîmarî li Kurdistanê û dewr û berande.

Pira Diyarbekir û Camiya mezin li bajarê Farqîn ku ji rex dewleta Dostekî ya kurdî ve ava kirine berî nehsed salan. Her wesa Kumbeta Helîme Xatûnê ku Îzeddîn Şerî Mîrê Hekarya ava kiriye li ser lêva derya Wanê, di sedê çardê de her wesa kela Bedlîsê û xandegeha quban li Amêdiyê nimûnên bilind ên mîmariyê me ne.

Dîrokê navên hinek hostayan yan mîmarên xelkê Kurdistanê hinayine ku ji derveyî welatî bi hinek karên mîmarî rabûne. Wek "Xîrmeşahê Xelatî" digel Semed kurê Îbrahîmê Tefîsî ebterxanek (bêmaristan-nexwoşxane) li bajarê Dîworişî (Dîvrişî) li Anadolê ku ji karekê hunerê bilind dihêt hijmartin, li cem dîroknivîsên hunerê Îslamî. Her wesa sê bira jî xelkê Urfa, li ser daxwaza dewleta Fatîmî çûne Qahîrê her yekê dergehekê Şurha Qahîrê ava kir. Her wesa Mihemedê Cezîrî pireka avakirî li ser "Nehrîl Meres" li joriya rojavaya bajarê Musilê.

Pêdviye li ser rewşenbîr û endazerên me yên xanî, û germav, xan û xwandegeh, tekye û kumbet, kela û şurhe û pîran li tev deveran wêne bikin û vekolana rengê mîmarî wan bikin ji bo saxkirina hunerê mîmarîyên me.

Endazer (Muhendîs) Rif'et Çadirçî vekolana rengê mîmarê xanên kevnên "Bab Şêxy" û Qenber Elî û Betawîn li Bexda û xanên taxên kevnên Besra û Musilê diket. Wî rengê mîmarî sax diket di avahiyên ciwanin hevçerx de heta di van salên borî de "Wezaretîl Îskan" şarezayên UNESCO anîn bo vekolana rengê mîmariya van xanên kevin.

Ev e heft sal e ez bi tenê pêkol bi pêkolê ve dikim heta niha min çend gotarek belavkirine, wek gotare bi dû pişka derbara rengê mîmarê telara Osman Paşayê Caf li Helepçe di rojnama "el-Iraq" de, hejmar 287ê Xizîran û Tîrmeh a 1980ê belav bûye, û gotara "Şêweyî Kelegî Le Hunerî Amedakirnewey Kurdî da" di kovara Karwan hejmar dû (2) da gotara "Fen-il-Î'mare vel Zexrefe fi tewîle" di kovara Karwan hejmar 8ê da. Bêguman dîrok van gotaran bi çîna yekê ji binaxê hunerê mîmariyê kurdî dê li qelem detin û serenca hinek ji rewşenbîr û endazeran rakêşaye heta di heyva Tîrmeha borî de sê endazerên mîmarî li Bexda hatin cem min: Endazer Serdar ebdullah, Îhsan Fethî û Fehmî Beşîr Mirad. Ev herduwên dumahiyê seydayên Kulica endazerên e li Bexda. Du roja min li Suleymaniyê gêrandin û mişe xanî û xanên sotî û Qeyseriya Neqîb wêne kirin û gellek hêbetî bûn bi rengê mîmariyê me. Ev salê jî dê hinek ji şagirdên kulica endazerê hinêrin bo vekolana xanên sotî. Ku ji şûnwarên babaniyane û maneve hêbetî ka çewa heta niha kora zanyariya Kurdî û rewşenbîran pûte bi vî mewzu'î nedaye, parê got: "Hozza mesuliyê tarixiye" (Ev mesuliyet e (birpirsiyarî tarixî (dîrokî) ye.)

Dûmahî, di hejmar 4a de.

Feqiyê Teyran

(Jîyan û Berhemên wî)

Prof. Dr. Îzzeddîn Mistefa Resûl

Werger: Mîkaîl Canpolat

Feqiyê Teyran yek ji helbestvanên herî kevnî kurd e. Her çiqas bîrek kûr û hûr û heştirinekê temam bi dijwariyên jiyana di helbestên wî da tê dîtîn û di hindekan da, bi taybetî di çîroka "Şêx Sen'an" da bi şarezayekî rêbazên felsefa îslamê tête holê. Lê, awaya piraniyê helbestan sadeye û li wê rêzeye ku bi helbestên millî tînan navkirin.

Helbestên Feqiyê Teyran bi zaravê kurmanciya jêrê da nav û dengê hêje û şaya şayan bi gor xwe nîne. Tenê hebûna çend destnivîsek helbestên wî di pertukxanên Ewropa da wesa kiriye ku navê wî li gor Kurdîstana başûr, dervey welêt pêtir belaw bûye.

JİYANA WÎ

Dîroknas Mehemed Emîn Zekî di derheqa Feqiyê Teyran da tenê ev çend rêzanan nivîsiye: "Feqiyê Teyran-xelkê Mako ye û di navbera salên 707 (h)/ 777 (h) riniye. Navê wî jî rasteqîn Mehemed e. Du pirtûkan wî yên bi navdeng hene (çîroka Şêx Sanan û sewla, Mespê Reş) û jî bilî wan gelek helbestvên wî hene û zaravekî sîruştî yê taybetî yê devera xwe karaniye" (2). Eladdîn jî di "mêjûyê edebî Kurdî" da jî wî sînori derneçûye (3). Ev çend rêzên di "kêşa kurdî" ya Dr. Bliç Şerko da jî her wesa hatiye nivîsin. Her çiqas ew wî bi Mehmed nav dîke (4). Ev nava di du rêzên helbestên "Gulbahar" ê da hene. Ango di wê da jî bi Mehmed tê navkirin (5).

Wesa xaya dibe ku ev her sê serokaniyan jî bo vê armancê jî ensîkloperda îslamê sud wergerîne. Wê jî ev salana her jî Kurdnas Alêksander JABA wergerîne, ku pêş hemîyan nivîsiye: "Mehemed Feqiyê Teyran (702 (h) / 1302-1303 (m) j 777 (h)/ 1371-1372 (m) helbestên xwe bi navê (M.H) ve belavkiriye, li muksê, li Turkiya jî dayik bûye. Destana Şêx Senan, Hikayete. Piling, hikayeta Hespê Reş bi pênivîsa wî hatine nivîsin" (6).

Gellek jî kurdnasan derheqa vê dîrokê her eva jî bo xwe bîngê girtine. Wekî T. arîstova (7) gelekê din. Lê S. B. soane sala 1307 bi sala jî dayik bûna Feqiyê Teyran danaye, sala mirina wî jî her wek xwe hîştîye (8). Dr. Maruf xeznedar jî wekî wî nivîsiye (9).

Evê di vê behsê de balê dikişîne du tiştin:

Yekem: Heta peydabûna rojnamenivîsa kurdî nehatibû bihîstin ku nivîsevan

yan jî helbestvan an navê nihîni hebin. Yan jî nasnavêkî bi du pîta pêkhatibû ekî (M.H). belkî nasnavê helbestvan bi navek ya hevalnavek yan jî leqebekî pêk hatîbûye. Eva herçiqas kurdnas Prym E. Socîn jî nivîsiye ku wesî Feqî bi navê (M.H) ve helbest belavkiriye⁽¹⁰⁾. Vîsil nîkîtin jî eva wana dubare kiriye⁽¹¹⁾ û di hinek şûna da ev du tîpa jî encama guherîna tîpa (h) ya kurdî di Rusî da bûye bi (M.X)⁽¹²⁾.

Di du qesîdan ku di destnivîsek muzexana musîl da bi navê Feqiyê Teyran ve hatiye tomarkirin, helbestvan (Mîm û Hê) li ciyê nasnavê xwe dinivîse:

*Mîm û Hê aqîl ve derde
Sicleya eşqî û derda
lew qelem anî bi serda
Mehfuyê xufranîn e⁽¹³⁾*

Ew (mîm û Hê) qelb û metalan her bi wan fikir û xeyalan rast dikin pend û mîsalan şahîrê nesîhetê⁽¹⁴⁾.

(Ango, silav bo firîştan ku bê sînorîn nayên jimartin her wek ava rubaran ran (ew silavana) jî melave li (Mîm û Hê) be.

Vekolînê dîwana Melayê Cizîrî ev (MûH) bi Mihemed dayî nasîn ku navê Feqiyê Teyran bi kar anîbe. Evê em dikarin bêjin (MûH) rastir e, ku rêkdikeve Mehemedî Hekarî be. Ji ber ku kurtkirina navê Mihemed di nav kurdan da bi Heme, Hemo, Memo, Memedî Mamend htd, hatiye. Lê bi rîh hev va negorêdayîne, di eynî demê da "Miha" di nav kurdên jorê da li ciyê "Mihe" yê. Kurdiya jêrê û kurt kirina navê Miheddîne.

DUYEM: Gelo danana van salana bi rêkî çî bo jî dayîk bûn û çî ji bo mirina Feqiyê Teyran jî kîderê hatiye? Bê guman ji destê A. Jaba da belgeyek hebûye. Ya di wexta xwe da ji serokaniyek bawer pêkîrî hatiye. Her çiqas Celadet Bedîrxan û gelek kesên din li cem wan wisaye ku Feqiyê Teyran hevdem û Feqiyê Melayê Cizîrî bûye û ji bo vê jî rêzên helbestekê dikin belge ku bêjin Feqiyê Teyran ji bo koça dawiyê ya Melayê Cizîrî gotiye û têda mêjûya koça wî tomarkiriye:

Heft (h) û (L) ji hev bûn cuda Şîn û girî dîsa têda⁽¹⁷⁾.

Margîret Rodînkî ev rêza bi hesabê Ebced bi du cura şîrovekiriye:

a) 1- (7xh) - (7XI) = 490-210=280

2.....)=300+20+200+10=530

3-280+530=810 (h)/1407-1408(m)

b) 1-(7+h)- L= (7+70)-30=47

2- Ş+K+R+I=300+20+200+10=530

3- 470530=577 (h)/ 1182 (m)⁽¹⁸⁾.

Li gor vî hesabî divê Melaya Cizîrî yan di sala 810'a Hicrî angî 1407-1408'e zayînî da koça dawiyê kiriye yan jî di 577'e Hicrî angî 1171-1172 ê zayînê da⁽¹⁹⁾.

Dr. Kemal Fuad vêrêzê bi rast dizane û bi dîrokê dizane ku Feqiyê Teyran ji bo mirina melayê Cizîrî gotiye û wêke dike bi belge ku di wê salê da ku li gor wî di

sala 1050'e Hicrî da Feqiyê Teyran zîndî bûye. Ji ber ku li gor wî şîrovekirina Rodenko rast nîne û ew vî awayî şîrovedike.

a) $(7 \times H) - L = 490 - 30 = 460$

b) $\text{Ş} + \text{Î} + \text{N} + \text{K} + \text{R} + \text{Î} = 300 + 10 + 50 + 20 + 200 + 10 = 590$

c) $460 + 590 = \text{hicrî} / 1640 - 1641 \text{ (m)}^{(20)}$.

Bi rastî rêz rûhn nîne gellek serê we hene û gellek kêm jî hatine bihîstin. Dî-roka jî dayîkbûn û koçkirinê bi vî awayî bête kirin, eger gellek pêve mijul bin dikarin bi çend curên din jî şîrove bikin, Wekî: $1 - 7 \times H - 7 \times L = 490 - 210 = 280$

$\text{Ş} + \text{Î} + \text{N} + \text{K} + \text{R} + \text{E} = 590$

$280 + 590 = 870 \text{ (h)} / 1465 - 1466 \text{ (m)}$

$2 - 7 \times 70 - 30460$

$\text{Ş} + \text{KRÎ} = 530$

$460 + 530 = 990 \text{ (H)} / 1582 \text{ (m)}$

Bi wî awayî rêzek ku bi van hemû curana tê şîrovekirin bo wê dest nade ku bê-tekirin bibingeha biryarek wesa hêsîn. Her eva wesa me dike ku dest jî van belgana hilgirin û biçine li ser ewên din. Bi taybetî ku em behs jî Feqiyê Teyran dikin û qet ne pêwîste jî her tim Feqiyê Teyran bi Melayê Cizîrî ve girêbidin⁽²¹⁾.

Di destnivîsa "Şêx Senan" a Feqiyê Teyran da⁽²²⁾ çend rêz hene di wê destnivîsê da. Di ya Rûdenko da ew rêz tunin. Di wan rêzan da çend belge derbara wan salan heye ku Feqiyê Teyran tê da jiyaye, "Şêx Senan" tê da tamam kiriye.

Yekemîn çarîna pênc dawîya di vê destnivîsê da dibêje:

Le Mîm û Hê û sûtî eşqê

Le dehsed û sala sêhê

(Meksî, lewê mesiyetê Tewîl dekat hikayetê

Her ev sal 1030'yê Hicrî ye di çarîna dawiyê da bi awayekî din dubare dibe ku dibêje:

(Meksî) le eşqî sotiye. ev şîire le Şêx ra gotiye halî xo têda gotiye Nî (xeyîn) û (lam) a hîcretê.

Wek em dizanin $X + L$ dike $1000 + 30 = 1030 \text{ (h)} / 1620 - 1621$ 'e mîladî. Dr. Kemal Fuad eva derxistiye ku ev $(X:t.L)$ yê hicrî di destnivîsa 1203'ya Berhîne da heye. Lê bi vî awayî...

Meksî ji eşqê suhtiye Ev şerîh bi Şêx venihtîye halî xo tê de gotiye ji xcîn û lama hîcretî⁽²³⁾.

Di rêzek vê mukalemê da ku didne pal pîşt Feqî û Melayê Cizîrî behsa sala 1031 têkirin. Ev rêz di dîwana şîrovakirîya Zivingî da nîne. Lê di "dîwana Kirmançî" da bi vî awayî hatiye nivîsîn:

Dizanim meddahî kême di hezar û yek û sehan

Senaxahê Melê me li hemû erz û cihan⁽²⁴⁾.

Her wek melayê Zivingî rêzek Feqiyê Teyran tomar kiriye ku wesa derdixê di 1041 (h) da hatîbe nivîsîn.

*Li Mehemed heft felek çûne
Ji hicret dewr gellek çûne
Hezar sal çîl û yek çûne
ev xezel hate diyare* ⁽²⁵⁾

Bi vî awayî em dikarin temamî bi vê rayê ve nêzik bibin ku Feqiyê Teyran di dawiya sedsala 16. û destpêka sedsala 17. ên zayînî da jiyabe. Lê ev bi tu şikleki wesi nagehîne ku divê Melayê Cizîrî jî her di wê serdemê da jiyabe. Ji ber ku belgên pêkve jiyana Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî tenê ew rêze ku hate behskirin. Ji guman bi der nîne, eger gellek bi hurî li wan mukaleman jî, vebikolin ku bi helbestên herdu helbestvanan tînan zanîn ya hatiye tomarkirin da em dibînin ku ji helbestên Feqiyê Teyran diçe û awayê rada helbestên Cizîrî dîr e. Wesa dibe ku Mela, Melayê Cizîrî yê bi nav û deng nebe û melayekî din be li Cizîrê jiyabe ⁽²⁶⁾. Her wek di wan çend rêzen Ehmedê Xanî da ku navê Melayê Cizîrî, bi Herîrî û Feqiyê Teyran ra tine zmên, evê ji bo me derdixê ku her sê pêş Xanî mirine ⁽²⁷⁾.

Her wesa rêzên ji wê jî derdiçe ku Melayê Cizîrî û Elî Herîrî pêş Feqiyê Teyran miribin. Xanî di wê da paş hêvî xwaziya ku Kurd qewarekî xwe hebe vêca ewê derdixê ku xwe di ya vê qewarê da ala helbesta Kurdî bilind kiriye û helbestên pêş xwe bi wê zindî kiriye:

*Mîn dê elama kelimî mewzûn
alî bikira libanî gerdûn
bê nave ruha Melê Cizîrî
pê hey bikira Elî Herîrî
Keyfek we bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimaye heyran* ⁽²⁸⁾.

Her çiqas em nikarin temamî di gel wê da bin ku ew helbestvanên navdar yê bi zaravê Kurmanciya Jorê helbest gotine hemû di dumahiya sedsala 16. an şunda ne. Lê ev raya Şerefexanê Bitlîsî di "Şerefname" da ku wesa kurd di palpišta wê da ku gellek xwendewar, zana û kabrayên mezin têda derûye, di ebedî edebiyat û helbest gotin û nivîsîn da kesî wesa têda derneketiye. Ev raya hertim belgeye bi destên ewên ku li ser wê bîr û baweriyêne.

NAVE FEQIYE TEYRAN

Ji bo çî ev helbestvanê me di nav xelk da bi Feqiyê Teyran tê naskirin? Rudenko di destpêka Şex Senan da nivîsiye: "Li ba xelkê wesaye Feqiyê Teyran helbestvanekî usaye ku wor ademzade, ji zmanê pez û hemû dewaran û tiştên giyan li ber

û bêgiyanên xwezayîyê tê digîhişt. Her navê Feqiyê Teyran xe şagîrtê Teyran digîhîne ⁽³⁰⁾.

Ebdulreqîb Yusif di şûnekê da ev ray wî heya û li cem wî wisaye ku Feqî weliyê Xudê bûye û kerameta wî hebûye û zmane hemî teyran zaniye ⁽³¹⁾. Lê her wî xwe di behsa Feqî da rayekî temam berewaja jî heye tê li ser wê ⁽³²⁾.

Ev awayên vekolîna Rudenko û kesên din her çiqas ji rastiye ve dûr nîne, lê hurdekarî û nîqaşê dixwaze. Eger ev belavbûna di nav xelkê da ji wê ve hatibe ku Feqiyê Teyran berhemên "Qewla hespê reş" û "Hikayeta piling" jî heye û perçeyek jî li hinde şûnan da tê hesabkirin li ser Feqî ku di gel avê da dipeyivî eva wesa dibû navekî din lê bihata kirin ne Feqiyê Teyran.

Herçiqas heta niha tiştêkî wîlo yê Feqiyê Teyran destê me neketiye û me nebi-hîstiye ku di gel teyran axîvtiye. Lû dûr nîne ev nava her peywen di nevbera destana "Şêx Senan" e. Feqiyê Teyran û" mentîq el a elî Şîr Newayî ve hatibe ku paşê em behs dikin.

Eger ev wesa be, divê navê wî di bingehê de Feqiyê Teyran bûbe û Feqe nîsbet dilde pal pîşt komela pez (Tîr) û (...) wî nişana komkirinêye di kurdî da. Ewê vê zêdetir diçespîne ewe ku di hinek şûnanda tê gotin Feqiyê Teyran ⁽³³⁾ bi bê (n). Ji ber ku di diyalekta Kurmanciya Jorê da gellek car (n) a komkirinê radikin peyvek ku mana diyar be, her bi (a) komdibin ⁽³⁴⁾.

Dehgeqe navê Feqiyê Teyran her Ebdîlreqîb Yûsuf xwe jî nivîsiye ku wesa Feqe xelkê gundê "TEYRAN" e û ev gunda dikeve navbera Muksê û Hêzanê û ew jî derdixe ku ev gunda niha jî heye û di nav danîştvanên Muksê û Hêzan da bi vî navî binav denge ku Feqe xelkê wî gundiye ⁽³⁵⁾.

Eger hebûna vî gundî rast be, ewa dibe delîla vedîtina gellek tiştan bi taybetî navê Feqî, herwek ev û ew çend rêzan jî ku me nivîsiye wê derdixe ku Feqiyê Teyran xelke Moks (Mîkîs) e û xelkê Mako nîne.

Xudanê Dîwana Kîrmancî gellek tiştan derheqa jiyana Feqiyê Teyran nivîsiye û hinek serpehatî tomarkiriye, ku xelkê wê deverê derbara Feqe hata naha dibêjin û hemî tekêlî curên bîr û bawerên efsaneyî yên vî xelkî bûye. Xudane, pirtûkê gellek bi bê xemî ve dinivîse: Ku wesa xelkê devera muksê Feqê bi xelkê aliyê xwe dizanîn û hinekew parçe û ew perçên şûnewarên nivîsi yên wî dest nîsan dikin ⁽³⁶⁾.

BERHEMEN WÎ

Berhemên Feqiyê Teyran dibe du beşan:

YEKEM: Ew berhemên ku bi devê dengbêj û çîrokbêjan ve bahîk bi babîk gîhiştine heta îro. Ev cûra ewqes belavbûya ku bi gellek tiştên folklorî ve tevlihev bûye. Rudenko di derheqa vê yekê de dinivîse: "Bê guman Feqiyê Teyran xudanê çend berhemên mezin yên edebî û felsefî ye ku di çêwe û çarçewa folklor da ji bo me mane. Zahmete di navan komelan de berhemên rasteqîn yên helbestvan bina-

sin. Bi gel wê jî pênivîsa Feqiyê Teyran di wê destane da ku di nav Kurdan da belave, diyare ku ew jî destana "Şêx Sanan" e ⁽³⁷⁾.

Ji ber vê çendê jî helbestvanên vê serdemê ew dersanana bê şik didine pal pîşt Feqiyê Teyran ku wan xwe jî jî xelkê wergirtine, nivîsîne û çapkirine ⁽³⁸⁾.

Komkirin û ji hev cudakirina eslê wan jî regeza folklorî di wan berhemên nav xelk da ku li ser Feqiyê Teyran hesab dikin û di hemî naşên Kurdistanê da belavkin, erkekî hûr û zanistî dixwaze û heta niha ew karî dirist nebûye.

Belavbûna helbestên Feqiyê Teyran di nav xelk de peywendiyekî temam di navbera helbestvan û folklor da dirist kiriye. Her wek helbestên wî tevli folklor bûye. Her wesa jî di nav xelk da bûye bi materyala destan, çîrok, berhemên nav xelkê karên mezin û yên hêzan mirov derbas dibe li ser wî hesabdikin. Her wesa destana wî "Şêx Sanan" bi awayekî seyîr di ser folklor da çûne di nav hev da.

DUYEM: ew berhemên bu qet nebe sedsalek ji berî niha hatine nivîsînê û hindêk jî wan hatine çapkirinê. Piraniya van jî ew destnivîsên ku A. JABA di dema xwe da anîbû ji bo Petersburg (Lenîngrad) û heta niha di pirtûkxana giştî salfikov-Şedrin û pirtûkxana Zanîngeha rojhelatnasî ya Akademiya Zanistî Sovyet da ne.

Rudenko di vê pirtûkê da ku behsa destnivîsên kurdî dîke ⁽³⁹⁾. Behsa tevaviya wan destnivîsan dîke. Di nav wan da ya here girîngtir ew destnivîsên destana "Şêx Sanan" in ku Rudenko xwe ew rêkxistin, pêşgotin ji bo nivîsiye di gel wergêrana Rusî da ev destana çapkirîye ⁽⁴⁰⁾.

Hinek destnivîsên din jî hene ku li ser Feqiyê Teyran tîn hesabkirin. Yek jî wan dastana "Qewla Hespê Reş" e, ku di destnivîsa "KURD 26" da. Danerê wê diyar nîne û di destnivîsa "Kurd 26" da li ser Elî Herîrî hesabdikin. Lê JABA Û SOCİN wê li ser Feqiyê Teyran hesabdikin ⁽⁴¹⁾.

Ev destana jî çîrokek efsaneyî ye, derbara şerekî diaxîve ku di navbera Musulmanan û Gawiran da bûye û Musulman têda serketine. Ev destana kiriye, biçin Hespê Reşê ji gawiran distinin.

Destnivîsa "KURD 26" destana "Kela Dimdim" di gel qizilbaşan li ser Feqiyê Teyran hesabdike. Rudenko dibêje: "Nabe Feqiyê Teyran Feqa nivîsevanê vê destanê be, ji ber ku Feqî di sesala çardehem da jiyaye ev çîroke, çerê rastqîn jî di sedsala 17em da rûdaye ⁽⁴²⁾. Di Dîwana Kirmancî da jî behsa wê hatiye kirin ku Feqiyê Teyran bi destanek li ser behsa şerê Dimdimê tomar kiriye ⁽⁴³⁾. Her wesa Dr. Ordixenê Celil di gel vegeerên folkloriyên Kela Dimdim da vegeerane tomar-kiriye ku li ser Feqiyê Teyran hesab dîke ⁽⁴⁴⁾. Di vê derê da nişanekî aşkera ya Feqê Teyran diyare. Ew jî eve ku (m.H) ya Feqiyê Teyran di dûmahiyê da hatiye tomarkirin;

*Di paş qisan ra
Ji nebiû ewliyan ra
Ji (Mîm) û (Hê) û xanra
Fathe jî rûhî wanra (45).*

Ji wê pirtûka Dr. Fuat Kemal ve eva ji bo me derdikeve ku di destnivîsên Berlin de tenê “Şêx Sanan” û end parçe helbest bi navê Feqiyê Teyran ve hatine tomar kirin. Ev destana têda nîne (46).

Destnivîsa “KURD 435” Lenîngrad bi vî navî ye “bît Feqî tîran ber avîra xeber daye”. Lê destnivîsek din nasnîşana “Feqî Batî li gel awî” li sere (47). Rudenko eva nîşandaye ku di vê destanê da navê Melayê Batê û Feqiyê Teyran tevlihev bûye û ev destnivîsa bavegeryanek folklorî ye û çîroka Feqiyê Teyran hesab dike (48).

Ewa piştgîriya vê raya Rudenko dike ewe ku destnivîsa “KURD 19” KURD 20” ji her destnivîsên vê dastana ev in: “Bît Feqî Tîxan ber avîra xeber daye”. Di wê da Feqe bi gel avê diaxîve û gîliyên xwe zaman û felekê dike ku xoşewîsta wî je qetandiyê (49). Di koma helbestên “Gulbîhar”ê da jî helbestekê li ser Feqî hesabdikin ku di gel emêMuksêqîsedike (50).

Ev jî pal pîšta raya Rudenko dike (51).

Dastana “Newala Sîseban” jî bi berhemê Feqiyê Teyran tê naskirin, lê Rudenko ev nivîsaya Feqiyê Teyran hesab nedikir (52). xwendanê “Dîwana kirmanet” li se vê Mîjarê îbêje ku dîr “qewla sîseban” ê anana Feqiyê Teyran be. Ji ber ku şewa vê destanê jî ya “xanê Dîmdim” diçe (53).

Destnîsîne “ûrd 27” jî komek helbestên îldariyê yê Feqiyê Teyran têda ye ku hindêk jî bi wî cûrê ku em paşê li ser diaxivin di koma “Gulbahar” da hatine belavkirinê (54).

Ew du berhemên mezin yê Feqiyê Teyran ku hatine çapkirin û bi vê sedemê ve em dikarin bi rêkî li ser wan bi axivin “Şêx Sanan” û koma helbestên “Gulbahar” êne.

ŞEX SENAN

Berî li ser vê pişkivîn ku yekem car kê destana “Şêx Sanan” nivîsiye, ev destana Feqiyê Teyran nivîsîna wî xwe ye, yan wergêrane û yan jî wergirtine bi destkariyê ve. Divê em ê yekê bêjin ku çîroka dildariya Şêx Sanan û koça gawir berî her tiştî di nav Kurdan da bi herlemek edebî folklorî ya hatiye nivîsîn û zanîn. Bi destana rasteqîn ya dildariyêtanîn. Ango berî dimana vê dariştina felsefî ya ve destanê di folklorîda bi pênivîsa Feqiyê Teyran bibînin. Nav û dengê vê evîne seyîr dibihistin ku di nav Kurdan da navê Şêx Sanan bi aşqekî binav û deng hiştiye ku aşqa wî bi çîrokekî rasteqîne û destçêkirî îlhama Xudê tê zanîn û şexsiyetê xwe bikesekî rasteqîn datine û bi destçêkiriya pênivîna hunermendekî danayîne. Melayê Cizîrî bi dildarekî rasteqîne hî navê Şêx Sanan tîne zmên:

*Mey nenonî şêxî senanî xelet
ew neçû nêv Ermenîstanî xelet
Mîslî musa wî tecellaya te di
ey tu di kanî xetayhanî xelet* ⁽⁵⁶⁾.

Ango “Şêx Senan mey bi xeletî (hele) venexwariye ew bi xeletî neçû Ermenîstan, wî wek musa tecelleyê te di (mebest xudêye) ewê tu dibînî kanêxeta, kîderêye xeletî?

Ehmedê Xanî demekê filosofane behsa dildariyê dike û eşq aşîqan, herdukan bi nîşandera sifate xude dizane û bi peykersazkirna xoşevîstiya xudê dizane. Ew di kêleka Leyla û Mecnûn, Şîrîn-Ferhat, Wamîq û Erza, Weyîs û Ramîn, Yûsîf û Zuleyxa da navê Şêx Senan û keça gawir ji tîne zmên:

Şêxê weku pênce hec bijîrî dîn kir ji bo keça gawirî ⁽⁵⁷⁾.

Ango: (şêxek 50 car cûye hec û ji bo keça din baye).

Şêx Senan dastanekî evîne ye û di nav Kurdan da bi navê Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsîn. Ev di nav Kurdan da belave çî di zargotinên folklorî da çî ewên hatine nivîsîn ku li ser Feqiyê Teyran tê hesabkirin, ku Şêx Senan, şêxekî mezin û gîranbû, pênc sed murîd li der û dorê bû, temeniya wî gihîştibûye 70 salî (hindek şûnda 77 sal) pênce cara çûye Hec. Lê çavê wî keça gawir ket ⁽⁵⁸⁾, dîn bû, aşîq bû şaşîk û siwakê xwe firand û avêt û zennara an girêda û çû dêrê û di nav gawiran da ⁽⁵⁹⁾ hate şandin cem berazan. Her çiqas Derwîş û murîd di gel mijul bûn ku jî kelê şeytan bête xwarê û bîzîvîre li ser ola îslamê li sûd nebû.

Di zargotina kurdan vê destanê da çî folklorî û çî ya Feqiyê Teyran da dibêjin: murîdên wî han didan û çûn cem şêxe mezin yê wê demê ku di zargotinê da bi Şêx etar tê navkirin, Şêx Etar hat, Şêx Senan bîtemamî bêzar dibe û mirina xwe jî hezret dixwaze û dawa jî xudê dike ku bîkuje. xudê behîştê.

Wek tê gotin ev destana di nav Kurdan da bi çîroka aşqekî rasteqîne û rûdayî tê zanîn. Gelo ev destan çîrokek folklorî bûye û paşê Feqiyê Teyran wergirtiye yan nivîsîna Feqiyê Teyran hatiye jî berkirin û li ciyê vê nivîsînê belav bûye dev bi dev, pişt û pişt hatiye guherîn? Ev pirsgirêka ya hemû ew destanên kurdî ye ku di bas-kirina wan da tê pêşiya me, bi teybetî derbara “Mem û Zîn” ê. Ji ber vê yekê divê her yek ji van destana bi cuda bikin û bersîva vê pirsiyarê bidin. Ji bo destana Şêx Senan awirê yekem rasttîre ango di nav Kurdan da hebûye û Feqiyê Teyran wergirtiye û qewa ji bo wê danaye. Vêca dûr nîne nivîsîna wî jî dîsan bûye bi seroqewarek ji bo wê danaye. Vêca dûr nîne nivîsîna wî jî dîsan bûye bi serokanî ji bo folklor. Ji ber ku zargotinek ve destanê ku bi folklorî tê hesab kirin jî aliyê saz-kirinê ve gellek ewa Feqiyê Teyran ve nêzîke ⁽⁶⁰⁾.

Ji bo destana Şêx Senan pirsiyarekî mezintir tete pêşiya me, ew jî peywendiyên destana Feqiyê Teyran bigel “mentîq el. Tîr” a Ferîdeddînî ETTAR (1119-1193.....)

û li gel "lîsan El-Tîr" a mîr Elî Şêr Newayî (1441-1501m) (61).

Rudenko dibêje: Çîroka dildariya Şêx Senan û keça di rowhelata nawîn û qafqasda yeksar baleve. Gellek dijware bi huriya wext û dewr û dûra peyda bûna vê destanê bê dest nişankirin û dû serokaniyan bikevin. Tenê em dikarin evê bizanin ku ev destana di civatek Îranî (zman) da û liserde nê peydabûna sofizm da hatiye holê(62).

Rudenko ev qisana ji vekolînek rojhelatnasê Rûs, Bêrtlîs wergîrtiye ku dibêje: "dastane Ettarî yan jî Newayî ve hatiye wergirtin (64). Her wek em nîkarin bêjin qet peywendiyek navbera wan da nîne. Ewa diyar ewe ku dastana Feqiyê Teyran wergêran nîne. Ji ber ku di hinek tiştên hûr da cudayî li gel wan gelleke. Feqiyê Teyran gellek dirêjtin behsa Şêx û muridên wî û sîciyên îbadetê dike. Eger dastana. Ettar bidestpêka Sofizmê bê zanîn-bi mana felsefî-yan derbirîna curek be jî sofizm û bîr û bawerên wê, di destana Feqiyê Teyran da dîmena peyda bûna derweşiyê û terîqetê diyare (65). Her çiqas jî aliyê pêyreva sofizmê ve bîr û rayên Feqê li gel wan nayê cuda kirin.

Serî heta binî ev destanana li ser bîra yekîtiya û bingeh hatiye çêkirin û evîn bi derxerî sîfatê xudê ye û bi pakkerê derûn jî xwe perestî, req û kîne datîne. Eger bi awayekî kurt bîrtemaşê bikin bîderbîrîna cîwaniya derûna mirovan dizanin û bi nişanderê bawerek bi tiyî însan di çoşe û dibe bîzavker û berevpêşkerê jîyanê.

Di vê destanê da serketin ji bo xestina pakiya mirov e. Şêx Senan wênapak û xoşewîstiyê ye û salan ciyê tenahî û îbadeta xoşewîstiya însan jî derûn bi hêzkiriyê. Ev xoşewîstiyê ne girêdayîye bi sûn û demanve. Eger di şêwa bê sînor (mutlaq) a îdeolîzmê da jî danabe, bingehêk cem ew her du serketinên mirow hesta pakyetî serketina yekîtiya însan û giyana xoşewîstî û brayetiye bratiye.

Dr. Ehmed Nacî qeykî çar regez di destana Ettar da dibîne:

1- Demek dirêj bi îbadetê ve mijul bûn û gihîştina pîrîtiye di xudê perestîne da.

2- Xoşewîstiya keça .

3- Gavîr bûn ji bo vê evînê

4- Vegeriyana li ser îslam (66).

Ev çar regezana di destana Feqiyê Teyran da jî têtîtin, lê sezkin û tîstên hûr da cudane. Ev belga tenê nîne ji bo wê ku Feqiyê Teyran jî destana. Ettar bi dûr nebûye. Belku eger di hinek zargotinên folklorî da çî di zargotinên folklorî yên Şêx Senan da bi Kurdî nivîsîna Feqiyê Teyran da navê Ferîdeddînî Etar kiriyê bi Şêx Etar û bûye bi kesekî diyar di çîrokê da muridên Şêx Senan wî jî şêxê xwe mezintir dizanin û hawarê ji bo wî dibin ku bê Şêx Senan bizivîrîne li ser ola xwe û waz ji keça bîne. Di zargînek folklorî da Şêx Senan jî muridên xwe re dibêje:

Ez xwe, xwe herim bêjim Şêx etarê

Wekî ew şehîr boyê min baxê û qîz boyêmin bûye henarê (68).

Ango “ez xwe, xwe diçim û jî Şêx Etar re dibêjim ev bajêr baxê kîç jî hî-nare”.

Di carîna hejmara 258’an da Feqiyê Teyran dibêje:

Tu Şêx Etarî Sadiqî rast û dirîstî xalaqî îro wekilî mutlaqî hîmnet ji fermane te tê(69).

Ango (tu Şêx Etarê rastgoşî rast û dirîstê xudêye îro wekilê mutlaqî, hîmnet ji fermana te tê)

Pîştî got û bêjek dirêj di navbera murîdan û Şêx Etar da dibêje

Melekî hadî bi xêr hat qîsa murşîd bi kar hat Şêx di destî Şêx Etar hat her wekî ji kehbê qetê dur ji behra, nûn û kafê Şêx anî keşae sofîyan berdan tewarê xaç hubênê dil ketê (70).

Ev jî hevçûyîna regeza afirandirî ji vê destana Feqiyê Teyran naye bîrîn. Ji her ku di di pal pîştî wê da Feqiyê Teyran ramana felsefî û sofitiya xwe bi awayekî sade û millî derbîriye. Bê vê ku bi tamanî li îstîlahata taybetî ya tesewufa îslam bî-rarînanê dûr be. Bi gel vê da jî bi Kurdî wênêyekî wan ramanan di sed sala xwe da nîşandaye û regeza vê drama însanî di wê şêwa sade da parastîye bi vî awayî jî xel-kê re ragiyandiye.

Her ev regeza însanî ya bilinde ku destana Şêx Senan bi nemirî hîştîye û wesa kiriye ku gellek helbestvan di sedsalên cuda-cuda da pîrsgirêka girîng ya sedsala xwe û giyana nemirêkî edemzad di bergê nû yê vegêrana vê çîrokê da nîşan bidin. Ev jî di hemû ew çîrokên Şêx Senan da diyar in ku paş Etar hatine nivîsin. Wek destana Wehdetî Geylanî (sedsala 19.an) (71) û destana. Huşen Cawid helbestva-nê Azerbaycan (1882-1941) (72) û yên din (73). Tiştêkî din jî divê dil vê kurte beh-sa Şêx Senan da bête kirin ku peyîva “Senan” ya vê dastanê jî kiredê hatiye? Hinek vê peyîvê guherîna navê “senha-sînha” ya welatê Yemenê dizanin; hinek jî bi gu-herîna peyeva “semhan”ê datînin ku diyê nave derekî an he (74). Her çiqas rêjîvan hemû vekolînan re diçe lê di karîn da heye rayekî din bixin be devê yên ku bi vê behsê ve mijulîn. Ew jî ewe ku di wê testa folklorî du Rudenko li Tîflîsê jî xelke wergîrtîye, navê Şêx Senan bûye bi a Şêx Sêdînya” (75). Her çiqas dûr nîne ev jî guherînek Kurdane ya peyîva “Senan” be. Lê rê tê da diçe ku “Sedînya” her “Sid-naya” ya nêzîkî Şame be ku dêrekî mezin têdaye dera “el-Sîdet” bî nev û denge û jî sedsalên navîn ve xelk diçe ziyaretê. Her çiqas di tekstê xwe da behsa welatê Gurcîstan têkirin. Lê çîrok xwek Feqiyê Teyran jî xelkê welatê Hekariya ye. Ev behsa Curcîstanê çûye nav vê çîrokê. Ev jî xosyeta folklore.

GULBEHAR

Ev navê koma helbestvane helbestane ku di sala 1957 da li Yerîvanêtiye çap-kin. Li ser bergê pirtûkê navê helbestvan Aram Çecanî heye. Lê di destpêkê da

nivîsvan dibêje: “Min her wesa di nav xelk da gellek helbest û çirokên helbestvanê Kurdî yê sedsalên naverast û realîst û demokrat Feqiyê Teyran komkiriye. Helbestvanê demokrat jî ji cem gelê kurd di nav Solê Kurd da tê gotin” (76).

Nîvîsevan qebul dike ku komek jî wan helbestên belavane yên Feqiyê Teyran komkiriye di “Gulbaharê” da ku berga wê wesa dardixe ku helbestên wî (Aram Çeçan) xwe bîn, çapkiriye. Rudenko ev helbestana li ser Feqiyê Teyran hesab dike ku di rûpelên 7 û 46’ên “Gulbahar” ê da hatine belavkirin (77).

Eger hevberkirina “Gulbahar”ê bi gel “Şêx Senan” bikin hest bi wê dikin ku evê yekem helbestên Feqiyê Teyrana û dev bi dev û pîsta û pîşt belavbûye û jî aliyê form û zman ve hinek regezên folklorî tekel bûye Le aşkera û diyare ku giyan û bîngêhû ramana Feqiyê Teyran têda hatiye parastin.

Di Şêx Senan da dengê mirov dillêrane bilind dibe di wêna drama da hawara xoşewîstiyê û serketin xwastiyê pak dike. Lê, di helbesta “açîm diwanê” ya vê diwanê da dengê helbestvan xwe ew denge dilêrî adamzade. Pirsgirêka mirov di vê derê da gellek bi ronahî diyare. Ramanên hûr yên Feqiyê Teyran û bi rastî bûyerên dîrokî gehîşîn dîmena van helbestan. Feqiyê Teyran di vê derê da bi helbestvanekî pêşketinxwaze ku çemd sedsal berî niha di gel çerxa dîrokê da dimeşe û xwe nîşan dide. Hawara mirina kavnarîyê û çewsandinê kiriye û banga serketina nû û Merdayetiyê daye (78).

Ez haçim dîwana Mîra nabim şarûrê koşk û sera bîra min xenn kêr û xencera Feqiyê Teyra tenge zarê dila Soştê min raken bi maşa li min xen tîr û kevana naçim dîwana mîr û hakîma Feqiyê Teyra rebenê dila hebûne dengbêj û şair bi rûh û dilva pîr fêqîr mîr û begara strana bê qîmet û melûl mane (79).

Ev dengê aşkereye jî wan sedsalan ve hota nahî beramberî li zulm û zorê û nakokiyên jiyana û çensadinê.

Feqiyê girtin-zîndanê dawerkirin qelem û defter destgirtin ew hafsê da hesr û jar kirin Feqiyê Teyra tenge zar kirin (80).

Çiqas guherîn bi ser van rêzan da hatibe her we digêhîne ku Feqiyê Teyran jî aliyê gel qehremane, çokê rasteqîn yê ramana nû û azayiyê ye Materyalên wî qelem û deftre, bîryara wî di civînên raman da serhişkiye:

Kurnêt mîr pir xedarîn zîndan bona nefse jarîn ez mirinê nakim figar, azayiyê dixazm her car (81).

ango (Kuren mîr pîre xedarîn, zîndan bo xelkê hejare, ez dest mirinê nanalim azayê dixwazim her car).

Dîmena hendîxanê di van rêzan da ancama azardana ramana nûyeî. Lê ew helbestvan çiroka Yusîf bi yad dike (82). Di hemû helbestên dildaye. Ku piraniye wan her î helbestên stran û folklorî Kurdî diçîn. Her çiqas wêne û dîmena cîwan di van helbestan da tê dîtîn û nozekî taybetî ya xoşewîntiyê têdaye, lê û azar he-wêna vê dildariyê ye û zû-zû bûbe jî jiyana Feqiyê Teyran û di meydana nivîsîna

jiyana jî da her ev belgaye ji bo me maye. Di hemû helbestên ê komêda derûna gelê Kurd dirbirîqe, eger behsa welat be yan behsu cîvak û evîn, ewa her bi dîmene azayiyê tê:

Dengê min nola bruska ewra wê here bihejehemû çiya hatani bêy dengê mif-textura ezê bistirêm bi têt û tembûra. Heger li sirgûnê, heger çindana da ezê bêjime cemheta xwe da bese bikişinin nirê zulum kar kara hûn figara nekin qeyd û çidana Hatani kengê ezê bêjim awa qelen ji helyayi destê min da ezê herim nava Kurda ezê wanra bistireên azayê eve gotina min heta hetaye (83).

Ev Feqiyê Teyrane stranên azadiyê ji bo Kurdan gotiye û hêviya wi ew nemiri bimine ji çala birçûyine derbiçe. Em hevîdarin ku ev vekolîna bibe di destpêka bask mezîna derbara vî helbestvanê me (84).

JÊRENOT

1- Piraniye helbestên Feqiyê Teyran di nav Kurdan da her bi stran têt gotin û beta niha piraniyê wan nehatine nivîsîn û tev li berhemên folklorî bûne.

2- Mehemmed Emin Zekî, dîroka Kurd û Kurdistan, rûpel 336

3- Elaaddîn Seccadî, mêtûy edebî Kurdî, Bexda 1952, r 536

4, Dr. Bliç Sêrkkö, "Rêşa Kurdî" Qahîre 1930, r 22 (bi zmanê Erebi)

5- Aramê Çaçan, Gulbehar, Yerivan 1957, r 22-30

6- JABA, A. Recueil de notices et re cits Kurdes S. Petersbourg 1860. P.S

7- T. Aristove, Kurdên qafqas, Mosko 1966, r 93 (bi zmanê Rûsî)

8- Soane E.B Grammar of the Kurmanjî or Kurdish Language, London 1913, h. VI

9- Dr. Maruf xeznedar, derbara dîroka wêjeya Kurdî ya nû, Mosko, 1967, r 23 (Bi zmanê kurd Rusî)

10- Prym E. Socin A. Kurdische Sarmlungen; I-II.S Petersbourg 1887,1890, 192

11- Basillî Nikitîn, Kurd, Mosko, 1964, r 389 (wergêrane Rusî)

12- Dr. Tefiq Ruşdi bi vi awayî ji bo xudanê pirtuka etarnamê wergêraye (hinêre, etarname, Bexda, 1968, r 612)

13 Ebdulreqîb Yusuf, Dîwana Kirmancî, Nefes 1971- rûpela 25

14- Serolkaniye berê rûpela 27

15- E- heqet el-cuhri fi serih dîwan el-şêx El-Cizîrî c. 2 El-qamisli 1958, s 915 (şîrah mella Ehmed Mehmud el-cihiti El-Zivingî)

16- Serokaniye berê

17- (Herekol Azizan Celadet Bedirxane (I.M.R) Herekol Azizan, klasikên me kovara Hawar, Şam 1943- r 524-525

18- Feqiyê Teyran, Şêx Senan, Mosko, 1965. r 4 (pêşgotin û belavkirina M.B. Rudenko). Bi zmanê Rusî.

19- Elaaddîn Siccadî, di "mêtûya edeba Kurdî" da sala 1407 ê miladî kiriye sala ji dayikbûna Melayê Cizîrî û sala 1481ê miladî ji kiriye sala mirîna wî. r 100

20- Kemal Fuad, Kurdischê Handschriften, Wiesbaden 1970, 4-6

21-Heta niha ew belgên ho hevçerxiya Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî tînin, rastiye wan pê neselmandiye.

22- Destnivisekî “Şêx Senan”e ku pêkhatiyê ji 336 parçe çarina. Ev destnivîsa me ji kak Dilşad Marîf koyî wergirt ê wek em agahdarkirin Kal Mihemed Emin Marîf (brayê i) li gundê Pelkane navça Pirdê ji kabrayekî kal bihîstibû û wekî xwe nivîsiye. Ev destnivîsa ji ber gellek sedeman materyalekî bar hevberkirî têdaye di gel destnivîsên din yê Şêx Senan da.

23- Dr. Kemal Fuad, govare Beyan, J.I, s 1972 r 36-39

24 Dîwana kirmancî, r 42

25- Mela Zîvingî, pirtûka navbirî r 914

26- Pîrşîreka sedsala jiyana Melayê Cizîrî ji behsek dirêje mijara lêkolînek din e.

27- Xanî xwe di “Mem û Zîn” ê da eva nişan daye ku li sala 1061 (h)/1650-1651 (m) ji da-yîk bûye, “Mem û Zîn” di 44 saliyê xwe da temam kiriyê.

28 Mem û Zîn, çapa Mosko, r 35-36

29- Şerefxan Bitlîsî, Şerefname, Bexda 1953,23-24, wergêr Cemil Hojbeyanî (bî zmanê Ere-bî)

30- Şêx Senan, Mosko, 1965, r 3. Pêşgotin bi zmanê Rusî

31- Dîwana Kirmancî, r. 123

32- Dîwana Kirmancî r. 122

33- Gulbehar, pêşgotin

34- Wek Sora, Kurda, Behdîna, Botî ji ciyê Soran, Botan, Kurdan, Behdînan

35- Dîwana Kirmancî, r. 122

36- Serokaniyê navhîrî, r 123

37- Şêx Sena, r 4

38- Etarî Şero, du dinya, Yerîvan, 1963, r 40-58, Gulbehar, r 7-47

39-M.B. Rudenko, wesfî komele destnûse Kurdiyekan Le lënîngrad, mosko 1961 (bî zmanê Rusî)

40- Şêx Senan...

41- Wesfî Komee... r 72

42- jêdera berê r 70

43- Dîwana kirmancî r 130

44- ordîxanê celîl, îposa qehremenê Kurd, xanê, lep zêrîn, mosko, 1967, r 67-72 (bî zmanê Rusî)

45- Jêdera berê, r 72

46- Binêrin parawêza hejmara (20)

47- wesfî Komele r 25

48- Serokaniyê berê

49- Jêdera berê 134

50- Gulbehar, 27-31

51- Mihemed Emîn Zekî du rêzan li ser Elî Herîrî hesab dîke ku her ji wê diçe ku guherînek ev helbestên Feqiyê Teyran be.

ey av û av, ey av û av lazim te me mecûbek hebê Ma tu bi eşqî suhbetî Yan meyîl û mensûbek hebê (Binêrin Meşahir El-kurd û el- Kurdistan r 76).

Di destpêka helbestên Feqiyê Teyran da jî wek di "Gulbehar" da htiye nivîsin. Bi vî awayî destpêdike:

Hey av, hey av û av Tu wa bê mînetî Mewcî û pêla dev bîlav nasekîni û nerehetî

xwedanê "Dîwana Kîrmancî" dibêje di xwendewarên botan da ûsa bela ve ku Feqê helbesta xwe "ey av û av" jî kêleka Dicle gotiye, li Finîkê ne gûtiye. Ew ciyê va li kêleka eşakî kail, nêzîkî 50 metre jî rêxa rast ya rubara finîkêye jî aliyê rojhelat û di nax ava Finîkê daye (r123)

52- Wesfî komele 67

53- Dîwana kîrmancî r 130

54- Gulbehar, r 9-16

55-

56- el-Heqed el-ccuhrî, s 327 (vekolînêrê Dîwana Melayê Cizîrî di beha çiroka Şêx Senan da nivîsiye: îşbihî jî di kitêba "el-hîstzere fi kel fin mîstzerf" da di benda 31'ê da çirokekî wekî vê tine zman û li ser Şêx Ebdullah Endelusî Bexadadî hesab dike (r 327)

57- Mem û Zîn, L. 21

58- Di nivîsînên vejeranên folklorî da bi kêça Gurcî tê navkirin. Lê di destana Feqiyê Teyran di li şûne kê avê "Erzî Ermen" dibe (r 102) û jî layekê bi kêça Ermen dizanî.

59-

60- Folklorî Kîrmancî, Yerîvan, 1936, r 311-327

61- Ehmed Nacî elqîsî Etarname, c. 2 Bexdad 1968

62- Şêx Senan, r 3

63- Y.E. Bêrtliâ, Newayî û Ettar, Lêningrad, 1928, r 54 bi zimanê Rusî)

64- Etarname r 614

65- Heta niha li ser "Terîqet" ê di Kurdistanêda vekolînek kûr û fireh nîne. Ew terîqetên ku di Kurdistanê da niha hene: Terîqeta qedirî, ku renge her jî dema Şêx Ebdulqedir Ceylanî ve hatiye Kurdistanê (1078-1167) Terîqeta Feqîsibendî jî Mevlana Xalîd (1777-1826) aniye Kurdistanê.

66- , r 854

67- Şêx Senan, r 6

68- Serokaniye berê, r 151

69- Jêdera berê r 126

70- Jêdera berê, r 130

71- Ev heta niha hêj destnivîse

72- Husên cawîd, Şêx Senan, Baku, 1958, r 153-260 (bi zimanê Ezerî)

73- Di Etarname da gellek behsa qewardana wê dike bi çend zman, her wek ew testên folklorî yên kurdî hatiye kirî qedir Fetahî qazî bi wergêrana Farsî ve bi çapkiriye, Tebrîz 1967

74- etarname, r 855-856

75- Şêx Senan, r 145

- 76- Gulbahar, pêşgotin
- 77- Şêx Senan, r 145
- 78- Di vê derê da bi naçarî hinek rêzên eqiyê Teyran dîubare dibin du di bunek din da bi cûrekî din vekoliye (binêre, el-waqayet fî el-adab el-Kurdiye Berût 1966, s 62-64
- 79- Gulbahar r 7
- 80- Jêdera berê
- 81- Jêdera berê
- 82- Jêdera berê r 12
- 83- Jêdera berê, r 42
- 84- Hez ji gotiniye em basa hemû ji aliyê nivîsevanê hêja Mehmud Zamdar ve wergêraye li ser zmanê Erebi û di kovara (el-şîqaft)a Bêxda de hatiye belavkirin.

Serwerê Teyran

REMEZAN ALAN

Baweriyên ku li Rojhilata Navîn derbûne, pîrr in û gellek dewlemend in. Di van de Silêman Pêxember -kurê Dawud û yê Batşeba- cihêkî girîng digre. Pirayî jî, bi vê taybetê derdikeve pêşiya me: Ew “zimanê hal”^{*} dizane, cin û bager di bin emrê wî de ne!”

Çavkaniya van baweriyên kitêbên evra û dînî ne. Mesela di qur’anê de, ev gewşîn wiha tê qisetkirin: “Dema Silêman bû warisê Dawud, (wiha) gotibû: ‘Gelî însanan! Ji me re zimanê çûkan hat hînkirin û her tişt hat dayin. Ev lîtfeka eşkere ye.’”¹

Mesnewiya Celeleddînê Rûmî de jî: “Dema çadira diwana Silêman vedan, teyr tev hatin pêşber. Ev zat, nepen û zimanê me dizane gotin û bi eşq çûn pêşber”² bi tê gotin.

Çavkaniya xwe bi wehyê bistînin jî, her bawerî wextekî diguherin. Sedemê vê guhertinê cûre cûre ne; hinek teolojîk, hinek jî sosyolojîk in. Em bi kûrayî niha naxwazin li ser van sedeman rawestin, lê bi kurtayî em dikarin bêjin ku, nabeyna baweriyên gel û yê dîn de ferq hene. Ev ferq, hin caran ji muqawemeta baweriyên kevin dizên. Çimkî baweriyên kevin -eger ji çandeka bi hêz û cihbûyî bin- zû zû ji holê rabin. Evan, di jiyana gel de cihêkî girîng girtine û kok dane. Ji wê yekê, di nav baweriyên nû de, ji xwe re rêyek peyda dikin û bi rengêkî di dijînin. Di nav Tirkan de hin baweriyên Şamanîst û di nav Kurdan de jî hinên Zerdeştî kirasê Îslamiyê li xwe kirine û bi vî awayî heta îro hatine.

Sedemêkî di yê vê ferqê jî ev e: “**Qir** (perîpherîe) û **bajêr** (centere),^{**} bi dîrokî jî hev qetane. Qir çiqas tevna bajêr a ku zanîn û şareza diafrîne dîrketiye, ewqas **gotinî** (verbal) maye. Awayekî di, tekoşîna di nabeyna qir û bajêr de³ di çandê de cihêbûniyek ava kiriye. Çawa Georges duby gotî: “**Qir dergûşa baweriyên kevin û batil bû.**” An, yê ku li bajêr lê nêrîn wisa dîtin.

*. Zimanê heywanan

** Ev bi wêjên dîroknaniyê ne, me di şûna wan de “qir” û “bajêr” bi kar anî.

1- Sûreya Neml, ayet: 16.

2- Mewlana, Mesnewî 1, Ist. 199, rp. 97.

3- Wek Gaques Le Gopp, Georges Duby, André Chédeville dîrok û bajêrzan, ev tekoşîn iktisadî bû, gotin. bajêr diva li ser qirê hegemonyaya xwe avakira. Çimkî çandeka ku ji baweriyên kevin paqij bûye, ancax bi vê rêyê mimkun bû. (Şehirler ve Kentler, M. Ali Kılıçbay, Gece yay.)

Çiqas asîmîle û koçber bibin jî kurd, îro folklorê wan pê rûyekî dewlemend derdikeve pêşîya me. Çimkî çanda wan hêj qirî ye. Ji ber ku kitêbên evra de hatîbin diyarkirin jî, hin bûyer û kes, di çanda gotinê de dibine efsane û mîtên balkêş. Yek ji van jî, çawa me li jor jî got: “Silêman Pêxember û teyr” in. Di nav kurdan de li ser vê mijarê gellek efsane hene. Emê jî li ser hinekan rawestînin.

Hûnê li jêr jî bibînin, destpêka van efsanan de (ya diduyan de bi eşkere, ya sîsêyan de bi fenî) jina Silêman Pêxember Belqîza, ji mêrê xwe nivînek dixwaze. Lê ev nivîn tê ji pûrtên teyra bî! Efsana dawî de, ev car belqîza, bi nazdarî û hikumranyê, ji textê xwe re, ku ji perê teyran çêbibe siyek dixwaze. Baş e, dibêje Silêman û gazi teyran dike. Sê efsanan de çûkaşevê (şevşevok, çilamehîrê, şevrevînek, baçermok) berya tev çûk û teyran de tê û bi lez tev pûrtên xwe dide diçe cem ferxikê xwe. Çûkên ku dijberê (muxalif) vê bûyerê ne bilbil, kund (bûm) û teyrikê Silêman (dîksilêman, hûdhûd) in. Lewma serî de nayîne pêşberê û paşî bi darê zorê tên. Dema fîrseta gazindkirinê bi destê wan dikeve, rasterast fikra xwe dibêjin û Silêman rexne dikin; gora wan Silêman pêxember bûye “mêrê bi gotina jinê”! Yeka dî, di van gazindan de rexneya keyfîyeta vê hikumranyê jî heye. Di bin zîmanê wan de “Bila tu kes hikumranyê bo kêfên taybet kar neyne” heye.

Ev efsane, “orijîn” in; taybetiya tiştêkî diyar dikin. Di van efsanan de, ku ji çavênîriyê hatiye dîtin rewşek, tê qisetkirin. Mesela şevşevok çima rût e û rojê dernakeve; an çavê bilbil çima kildayî ye; kund çima xwînsar e û an jî ku li cîkî danişê çima lê dicivin; çima piştî stûyê teyrikê Silêman gij e?..

Li jêr, ku ji Sêrt, Ruha, Mêrdîn û hekarî hatine darêjkirin çar efsane hene. Tev jî bi devoka qisetvanan hatin nivîsandin. Ji ber ku dewlemendiya vî zîmanî çêtir xuya be.

BILBIL û ÇÛKA ŞEVÊ 4

Silêman Pêxember gotiye: “Ezê Belqîza re ji pûrtên teyra nivînek çêkim. Ji vê yekê gazî tev teyra kiriye. Çûka şevê, pêşîya tavan hatiye û ji leza pûrtên xwe tev daye; çimkî ferxikê wê li malê tenê bûne.

Dibêjin pişt wî rojê çûka şevê maye rût.

Teyrên dî jî hatine û pûrt dane. Silêman pêxember nêriye bilbil di nav teyran de nîn e. Aciz bûye, du teyran şandîye pê ve. Teyr çûne wî anîne hizûrê. Hz. Silêman gotiye: “Tu çima nehatî, qey te nizaniya?”

Bilbil bi halekî rehet: “Ya Silêman, ya zanîne ez dizanim, lê Xwedê hij^a rastiye kirîve, ji bo kêfa te û belqîza, vê zivistanê nikarim deng û canê xwe bidim! Ez tu

4- MihêÇeçen, Sêrt/Şêrwan, 62, Serbest, Xwedî nîn e.
a: hij: hez, hes.

purtan nadin.” gotiye.

Ev sozên merd gellek li xweşê pêxember çûne. Yên ba xwe re wisa ferman kiriyê: “Bilbil mêrekî merd e, çavê wî kil din, wî berdîn.”

Kesê bilbil dîtibe, xweş dizane, ber çavê wî kildayî ye.

KUND û ŞEVŞEVOK⁵

Dibên rokî Belqîza, ji Hz. Silêman ra dibê, “çiyê min uşk^b e, pišta mi û kulîmekê mi pir dêşî. Ti zimanê teyr û tûra^c dizanî; ban ke wan, ka em ji pûrtan doşegekî û balgîvekî nadin dirûnê?”

Silêman pêgember banga teyr û tûra dike. Teyr û tûr tèn pûrta xwu dirûçkînin. Şevşevok tê xwu tev dirûçkîne.

Niha ji rûçikiye, bo ro nikare derkeve der: Fedî dike, şevê derdikeve.

Dûv ra kund tê. Lê kund rûçikandinê qebûl nake. Hz. Silêman kund ra dibê: “Kundo, dê birûçike!”

Kund dibê: “Ti fedî nakî, bona jina xwu teyr û tûra didî rûçikandin?”

Silêman pêxember dibê: “Ka binêr, ka binêr, ev serê mezin de çi heye!”

Kund dibê: “Qala wî serî meke, va ser gişk aqil e.”

Silêman pêxember dibê: “Ka binêr, vî qûna mezin!”

Kund dibê: “Qala vê qûnê meke, va qûn gişk namus e.”

Silêman pêxember dibê: “Ka binêr wan çavê zerik!”

Kund dibê: “Qala van çava meke, va çavan gişk nezer in û nezera çavê mi fereh e.” Û dîsa dibê: “Ti mi da kêmanî digerî, kêmaniya mi tune. Hebî zêdebûna mi heye. Ti bûyî bindestiyê jina xwu, bona kêfa wê pûrtên teyr û tûra didî weşandin.”

Ser vî dibên Hz. Silêman, “kund berdîn,” gotiye. Kund berat kiriye; lê ji bêîte-tiya wî hatiye nalet kirin.

ÇILAMEHÎRÊ Û BÛM⁶

Go jina Silêman Pêxember, xwe ji qazî^d li nexweşiyê danî. Gote mêrê xwe, “Ez nexweş im.” Livîna^e wê danîn, ewê li ser livînê xwe dirêj kir.

b: uşk: hişk.

c: tûr: têr, teyr.

5- Rehîma Donan, Ruha/Siwêrek, 75 Kebanî, Xwedî nîn e.

6- Şerîf Demîrtaş, Mêrdîn/Kercews, 40, Memur, ji dibistana-navîn mezun e.

d: qazî: qest, qestikan,

e: livîn: nivîn.

Wextekî jina Silêman, bi xef, nanekî sêlê dixwe bin livîna xwe. Çaxa nanê sêlê hişk dibe, di bin doşekê de dibe qirpe qirpa wî.

Silêman dibêje: “Ev qirpe-qirpa çi ye.”

Jin dibê: “Livîna min hişk e, paresûyên min jê dişkên!”

Silêman jî dibêje: “Ezê temamê çûkê dinyayê bidme hevdu û ezê ji te ra ji pirtikên wana livînekê çêkim.”

Pêxember, gazî çûkê dinyayê dike. Wanakê tên. Ji wan ra dibêje: “Jina min nexweş e, livîna wê hişk e; ezê pirtikê we jê re bikme livîn.”

Çilamehîrê^f tê û pêşiya hemîçkê çûkan xwe dipirkêne û diçe. Lewra îro li ser pirtik tunin.

Bûm jî li civata çûkan hazir bûye. Silêman ra wilo gotiye “Hêdî, ronaya çavan, ezê tişteki bêjim!”

Dema izin standiye wa gotiye: “Ka livîna jina xwe hilde; ew çi bin livîna de heye.”

(Dibên çavê bûm dijwar e, tûj e. Ewî dîtiye ku jina silêman nanê sêlê xistiye bin livîna xwe.)

Dema Silêman Pêxember livîna jina xwe hiltênî, dimeyîzîni ku nanê sêlê ê hişk bin livîna wê da ye. Fêma dike ku jina wî ji qestê wilo kirye.

(Dibên bûm wexta ku cîkî datîne, çûk lê dighên hev. Dibe çire-wira wan. Ew dibê, “Mi bixwe”, ew dibê, “Mi bixwe”. Çi ya ku bûm wana xelas kirye.) *

TEYRIKÊ SILÊMAN 7

Jina Silêman Pêxember Belqîza, rojekî jê re dibêje: “Min li hewa textek divê; bila çûk û teyrên te jî jê re bibîtin sih!”

Silêman Pêxember, Belqîza re textek girêdaye û bangê teyran kiriye. Teyr hatine ser Belqîza de çengê xwe vekirine û jê re bûne sih, lê hûdhûda -Ku em jê re dibêjinê teyrikê silêman, an dîksilêman- ne di nav wan de bûye. Silêman Pêxember du teyran şandiye pê ve. Ewan çûne hûdhûda anîne hizûrê. Silêman girtiye pişte-stuhê hûdhûda û bilind kiriye; gotiye: “Tu li kû mayî, çima nehatî?”

Hûdhûda, “Ferxikê min li malê tinê bûn, destê min ji wan neqeta!” gotiye. Û pê re, vî gazindî jê kirye:

“Heyfa te, ku ti ketiyî bin emrê jina xwe. Bo vê tu îro me didî eziyetê.”

f: Em Mêrdînî, havînan gellek “mehir” çêdikin û em mehîra xwe datînine ser banan, ji buyî ku bicemide. Ev çûk jî derdikeve derva û hin caran dikeve nav mehîran. Ji wê yekê em jê ra dibêjin “çilamehîrê”. (qisetvan)
7- Casim Ören, Hekarî/qilaban-Mihray-55, Ticar, Xwedî nin e.

* Herhalde dema kund (bûm) nîzikê çûkan datîne, çûk tirs digrin. Jibo, ku kund tengezar bibe û ji wê derê bireve, dibe çire-wira çûkan. Lê gel vê çavnehiyê, wek efsana jorê de şirove kiriye. (darêjvan)

Silêman hêj xwe hesaye û heq daye hûdhûda. Ji teyrên dî re jî, “Hûn serbest in” gotiye.

Teyr ketine rê û çûne. Lê pişta stûhê hûdhûda wê rojê ve wekê nikulekî maye gj. Lewma carna jî em vî teyrikî re dibêjin “dîksilêmanê dinikil” **

** Qisetvanê vê efsanê Casim Ören, ji bo vî teyri çend teybetên dî jî got:

I. Çavê vî teyri pir tîj e, ava çend tebeq bin erdê de dibîne. Lewma Silêman Pêxember wî kiriye seqayê artêşa xwe. (Ev taybetî, Mesnewiya Celaeddîne Rûmî de jî dibore. Binêrin: “Mesnewî 1, rûpel 98, -darêjvan-)

II. Dibêjin, ki hestiyekî vî teyri li ser xwe bigerîne, tu derb û gule tê de naçe. Ew, mirov mihafeze dike. Lê çi awayî? Tê mirov hûdhûda bavêje aveka kelijî, tê bikelije, bikelije, heta ku hestiyekî wî ji goştê wî bikeve û derkeve ser rûyê avê. dema ew hestî derket, tê mirov wî li kinckî paqij bilefîne û wek hemayîlek xwe ve bike.

III. Dîsa dibêjin, dema te hudhuda kuşt, xwîna jê hat hinekî ziwa bike û wextekî di nav kil de bikute û paşî çavê xwe bide. Tu nexweşiya çavê te tê nemîne. (Lê nebî tu kes van metodê efsûn û hekîmiya kurmançî li ser xwe tetbîq bike! -Darêjvan-)

Termînolojiya Qîz (Keç) Xwestin û Dawetê/Dîlanê

SEÎD VERROJ

Di vê nivîsê da ez dixwazim ji teferîwatê bêtir li ser termînolojiya keç xwestin û dawetê/dîlanê, li ser hin adet û toreyên bi wan ve girêdayî rawestim. Ev xebata hanê li ser derûdora Diyarbekir; Pîran, Pasur, Gêl û Çêrmugê hatiye çêkirin. Lewma, dibe ku li gora herêmên dî hin ferq û cihêti hebin. Ji bo ku tevlîhevî çênebe, ev terîman (navlêkan) li gora girîngî û bi dorê hatine rêz kirinê. Ez van terîman (navlêkan) hem bi Kurmancî û hem jî bi Dimilî dinivînim.

Keç/Qîz xwestin: Malbat di nava civata kurdan da xwedî çiyekî pîrr girîng e. Ji ber vê yekê, keç û lawên ku berzewac bûne, dayik û bavê wan dixwazin gavekî zû wan bizewcînin. Ne tenê dayik û bav, her weha derûdor jî bi çavekî erênî li keç û lawên azeb nanêrin. Lewma gotine: "Jin û mêr tevr û bêr e." Eger keç û law bi dilê hev bin û dayik û bav jî dilxwaz bin, bi gelemperî jî bo xwestina keçikê astengekî namîne. Dema ku dilî bi dil be û astengek jî li pêşberê wan tune be, aliyê lawîkê bêteşxele û bi rehetî keçikê dixwazin. Lê belê carina hin asteng û neyînî çêdibin; qest û qerez derdikevin holê, dayik û bav razî nabin yan jî pis û pismam razî nabin (her weî ku tê te gotin: "Min dil hebû te dil hebû, gundî û malî qayîl nebû"), carna jî keçîk bi xwe dilxwaz nabe, wê demê keç revandin çê dibe.

Keç/Qîz revandin-Cenî remnayîş: Her çiqas zêdetir ne bi dilê malbata keçîkê be jî û ji aliyê merivên wî xweş neye dîtîn jî, ev bûyer di nava civata kurdan da heye û wek adetekî tete qebûl kirin. Dibêjin ev bûyer jî pêxêberan maye. Keç revandin, carna bi xwe ra dilşikestinî û hin bûyerên nexweş û şer jî peyda dike. Her wekî ku di kilama jêrîn de jî diyar dibe, bi pîrranî keçîk gazinên xwe ji vê rewşa hanê dikin û bi şîk li revê dinêrin.

Lawîk:

Dil ketiye ray lê nabe

Navê revê ne xerab e.

Keçîk:

Navê revê pîrr xerab e

Pozê bavê min bejêr nabe

*Pismam pîrr in, bê şer nabe
Eşîra min qayîl nabe*¹

Di hin kilaman de jî, tersê vana têtê dîtîn. Pêşniyaza revê ji keçikê tê. Her we-
kî ku di kilama "Lawikê Mitînê" de keçik dibêje:

*Lêlê dayikê heyranê!
Tiyê rabe serê min bişu
Xemla min li min ke
Keziyê min bihune
Îro sibê ciwabekî bişîne
Pey lawikê Metînî, delalê malê
Bila were min bixwaze an jî birevîne
Xwazginîkê min rûniştine,
Qelenê min tînin
Wê sibê min bi rê kin*²

Di kilamekî dî da jî weha têtê gotin:

*Delalê malê şekirê sor e, nav desmalê
Ez ne bi mal im, ne bi mêr im
Ez xwişka heft biran,
Diwazde pismamên wekê şêr im
Gava çav bi delalê malê dixim
Ez mal hemu bi duvê teşîya xwe vedişêrim*³

Yên ku qîz birevînin, bi pirranî xwe davêjin bext û piştî maleke navdar û bi gewet, ku karibin dawa wan çareser bikin û girê bidin. Kurd vê yekê wek namûs û şeref qebûl dikin û yên ku xwe avêtine ber bextê wan, mîna ewladên xwe dihe-sibînin û li wan xwedîtî dikin; di şûna wan de qelen didin û hewce be daweta wan jî di mala xwe da çêdikin; ku dawa giran be xwe xwediye dawayê dibînin.

Herê kirin/Herê kerdiş: Dema keç û xort hev bibînin û biyecibînin, dê û bavê xort yan jî dostekî xwe bi tevî hin diyarî û xelatan dişînin mala bavê keçikê. Eger

1- Ziya GÖKALP, Kürt Aşiretleri.

2- Gelêri.

3- Gelêri. M. Evdrehman.

diyariyên wan werin qebûl kirin û bersivekî erîni bête dayin, ev tê vê manê ku mesele nîvenîv hal bûye. Ji vê bûyerê ra dibêjin 'herê kirin'.

Xwazginî: Piştî 'herê kirinê' ewan kesên ku ji aliyê malbata lawik ve têne vexwendin, ji bo keç xwestinê diçin mala bavê keçikê, ji wan ra dibêjin xwazginî/xwazgîn. Ji vê bûyerê ra jî dibêjin **xwazgînî**.

Qelen/Qelend: Ew pere yan jî tiştên ku ji aliyê malbata keçikê ve, ji malbata lawik têne xwestin. Di nava civata Kurdan de qelend xwestin/girtin, wek adetekî bi cî bûye. Qelend wek heqê şîrê dê tête qebûl kirin. Car caran gelek keç û xort ji ber zêdebûna qelendê nikarin bigîjin miradê xwe. Keçên ku malbata wan dewlemend be, zadegan be, qelenda wan jî zêde dibe. Lewma dibêjin: "Keça mîran bi qelendê gvanana naye." Belê rast e, mî bi lingê xwe ve, bizin bi lingê xwe ve têne daleqandin. Demên berê qelend xwestin hîn zêde û belav bû, lê evro û her roja ku diçe kêmîr dibe.

Şîranî: Piştî keç xwestin û qelend birînê, ewan xwarin û vexwarinên ku ji bo wê seremonî û vexwendiyên tête pêşkêş kirin.

Destgirtî (desgirtî)-xwestî-waşta (e): Navê ew keça ku ji bo xortekî hatibe nîşan kirin yan jî xortê ku ji bo keçekî hatibe nîşan kirin.

Nîşanî/Şerbet: Piştê keç xwestinê, ew zêr û zîvên ku ji bo bûkê hatine kîrîn, bi seremonîkî pêve dibin, ku ji vê seremonî ra dibêjin nîşanî yan jî şerbet. Ji ber ku di vê seremoniyê da şîranî û şerbet tête xwarin û vexwarin, lewma dibêjin şîranî yan jî şerbet. Nîşan wek nîvdamwetekî tête qebûl kirin. Di vê seremoniyê da bêtir merivên herdu alî yê nêzik beşdar dibin.

Cihêz/Cêz: Ew alav û tiştên ku ji bo bûkê hatine hazirkirin û kîrîn. Ji bo cihêzê berpirsari bêtir li ser diya keçikê ye. Zêdebûna cihêzê, bûkê payebilind dike. Gotina "bextê dê, cihêzê qîzê" bi vê manê tê xebitandinê.

Cihêz raxistin-Cêz ravistiş: Cihêz ji alî malbata keçikê ve tête raxistin. Berê dawetê, cihêzê ku ji aliyê bûkê ve hatiye hazir kirin, ji bo hin vexwendî û merivên zava yê nêzik tête raxistin û ravedanê. Vexwendiyên ku diçin cihêz raxistinê, her yek li gora rewş û qeweta xwe diyarî û xelatekî davêjin ser cihêzê.

Perrû kirin/perrû kerdîş (ser bide kerdîş): Qîza ku xwestî be, ji aliyê malbata zava ve, zêdatir di roşanan de, ku roşan nekeve ber, di zemanekî dî de tête ziyaret kirin. Di vê serlêdan û hevdiîtinê da bi pirranî meriv û nêzikên zava cî digrin. Ji van vexwendiyên her yek li gora qeweta xwe xelatekî (ev xelat qumaş, alavên nava malê û carna jî pere ye) ji bûkê ra dibin. Perrû kirin, dibe ku ji carekî zêdetir, çend car be jî.

Xinamî: Merivatiya ku bi qîz xwestinê di navbera malbata qîzik û lawik da çê dibe. Di hin herêman da li şuna "xinamî", **Xisim** tête xebitandin.

Berdêl: Du malbat beramberê hev qîz bidine hev, ji vê bûyerê ra tête gotin

“berdêl”. Ew keça ku berdêl be, ji wê ra jî dibêjin **berdêlî**.

Xwendî: Ewan kesên ku ji aliyê xwediyê dawetê ve ji bo dawetê hatine vexwendin, ji wan ra dibêjin “xwendî.”

Qasid: Ew kesê ku ji bo vexwendin û dawetkirinê dişnin li pey nas, dost û gundiyan. Li hin deveran li şuna “qasid”, “rovî” tête karanîn.

Dawet /Dilan/BÛ (dêrsim) /Veyve: Navê ew seremoniya ku ji bo îlankirin û ravedana zewaca keç û lawekî di civatê da nîşan dide. Di civata Kurdan da dawet adeteki kevneşop û pirr girîng e. Dawet qasê şînê mûhîm tête dîtin. Ji ber vê yekê, her kurdekî heta ku ji destê wî tê, zewaca xwe bi dawetê çê dike.

Dawetên Kurdan bê saz û tembûr, def û zirne çê nabin. Her daweteki Kurdan da bêguman sazband yan jî dengbêj hene. Ew kesên ku di dawetan da sazbandiyê dikin, zêdetirê wan aşiq/mitrib in. Aletên mûzîkê jî def û zirne yan jî bilûr û elbane ne. Dema ku def û zirne yan jî bilur û elbane tûne bin, şuna wan dengêj bi kilam û starnên xwe yên rengîn dadigrin. Denbêj bi kilamên xwe yên renga reng halana didin govendgêr û reqsan da ku govendê xweştir û geştir bikin. Carna jî bi kilaman qirfan û henekan li hev dikin. Ew kesên ku xweş govendê bigrin, ji wan ra dibêjin reqas yan jî govendgêr. Ew kesê ku serê govendê bikşîne ji jî wî/wê ra dibêjin sergovendî. Yê ku dawiya govendê bikşîne ji wî/wê ra jî dibêjin gavan yan jî boçîkçî. Li derûdora Diyarbekirê cûreyên govendê yên ku têne girtin ev in:

1. Delîlo/qilanc
2. Tik
3. Heranî
4. Giranî
5. Yekling/Yewling
6. Duling/diling
7. Koçekî/Veracê

Dawetên ku bi dengbêjan çêdibin, li wan dawetan cûre cûre stran û kilam têne gotin; berbûkî, serzavayî, dilokî û hevalkî ji wan hinkî ne. Cûreki stran jî hene wek pêqerezi û pêkenokî têne gotin. Ji wan stranan du mîsal li jêrê hatiye nivîsîn.

Nêrgizê Nêrgizvanê

Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgizvanê

Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz dewkilê bêrîvanê

Îşev şevka baranê Nêrgizê, Nêrgizvanê

Îşev şevka baranê dewkilê, bêrîvanê

Eger tû dosta min î Nêrgizê, bêrîvanê

Were em herin vê dîlanê dewkilê, Nêrgizvanê

Çavê min li xewka şîrîn Nêrgizê, Nêrgizvanê

Destê min li destê yarê dewkilê, bêrîvanê
 Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgizvanê
 Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz dewkilê bêrîvanê
 Nîşan dayne hewşêyo Nêgizê, Nêrgizvanê
 Nîşan dayne hewşêyo dewkilê, bêrîvanê
 Eger tu dosta min î Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Were em herin dîlanê dewkilê bêrîvanê
 Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgizvanê
 Lê Nêrgiz, Nêrgiz, Nêrgiz dewkilê bêrîvanê
 Eger tu dosta min î Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Were em herin dîlanê dewkilê, bêrîvanê
 Çavê min li xewka şîrîn Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Destê min li destê yarê dewkilê, bêrîvanê
 Îşev şevka baranê Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Îşev şevka baranê dewkilê, bêrîvanê
 Dîkan daynin eywanê Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Dîkan daynin eywanê dewkilê, bêrîvanê
 Were em herin dîlanê dewkilê, bêrîvanê
 Çavê min li xewka şîrîn Nêrgizê, Nêrgizvanê
 Destê min li destê yarê dewkilê, bêrîvanê.

Mîşkê Kor^{*}

Şûrek hebû lê şûrek hebû
 Şûrek hebû lo çar cexme bû
 Me ji wî şûrê lê gêsîn çêkir
 Me bi wî gêsînê lo çiya kun kir
 Me ji wî çiyayê ambarek dagirt
 Mîşkê Kor bû lê kar jê çêkir
 Werisan bînin, lo werisan bînin!
 Werisan bînin, lo bavên erdê
 Kêran bînin, lo kêran bînin!
 Kêran bînin, lo serjê bikin

* Ev strana han, ji bo qerf avêtinê di dîlan da têne gotin û bi wan govenda tik ji tête girtin. Gotina vê stranê da her rist ducar dibe û govendêr li hev vedigirînin.

Biviran bînin, lo biviran bînin!

Biviran bînin, lo biqelişînin

Dasan bînin, lo dasan bînin

Dasan bînin, lo hûr hûr bikin!

Sîtilan bînin, lo sîtilan bînin!

Sîtilan bînin, lo qeliyê çêkin

Para gundiyan lo jê derbînin

Hestiyê qunê lê bidin xatûnê

Hestiyê navê lo bidin zavê

Hestiyê hukê lo para bûkê

Kina mîzê lo para qîzê

Dil û gûrçikan lo bidin keçikan

Hûr û muran lo bidin mûduran

Hûr û pizuran lo bidin xezuran

Çerm û berman lo bidin cendirman

Ser û piyan lo bidin xwendiyân

Rîviya dirêj lo para dengbêj.

Di dawetên Kurdan da wek spor û skeçê (kenok) hin leyztik jî têne leyztin; cîrît, siwarî/hesparî, aşvan, kalik/kose, daleqandin, pes û gur, ha dewo, sînor... hwd.

Şebaş: Ew xwendiyên ku ji dûr ve werin dawetê (bêtir ji merivên zava) aşiq (sazbend) diçin pêşiya wan, ji wan geştê (pere) dixwazin. Ji vê bûyerê ra dibêjin şabaş kirin.

Şeva henê/Şewa henê: Şevêkî berê hewilandina bûkê çê dibe. Roja dawetê ya dawî êvarê diçin bûkê hene dikin. Di eynî êvarê da zava jî hene dikin. Roja di jî bûkê dihewlînin. Şeva henê dema ku bûk û zava hene dikin li ser wan hin kilam têne gotin. Ew kilamên ku li ser bûkê têne gotin, ji wan ra dibêjin *berbûkî*. Ewên ku li ser zava têne gotin, ji wan ra jî dibêjin *serzavayî*.⁴

Sergirêdanî û piştgirêdanî:

Ew jina ku bûkê bixemlîne, ji aliyê malbata zava ve ji bo wê xelatekî tete diyarî kirin, ji wê xelatê ra dibêjin heqê *sergirêdanî* û *piştgirêdanî*.

Mar/Mare: Pêwistiyek (wacibek) dinî ye. Mar, ji aliyê melekî ve tete birrîn. Şertên mar birrînê gelek hatiye sivik kirin. Gelek caran bûk û zava bi xwe beşdarê vê seremoniya dinî nabin. Her yek dikarin li şuna xwe wekîlekî tayîn bikin.

Li gor adetên Kurdan, dema “mar birînê” çî eyb û kêmasiyên bûk û zava hebin têne gotin. Tişteki balkêş jî ew e, li gor baweriya Kurdan: Dema mar birandi-

4- Ji bo mîsalên van stranan binêrin: Seîd VERROJ, War, hejmar: 1, rp: 116-120.

nê, ew kesên ku li wê derê hazir bibin, gerek destê hemiyar vekirî û pêçiyên wan jî dirêj kirî bin. Eger yekî destê xwe bigre yan jî destên wî/wê girtî bin, bûk û zava jî têne girêdanê; nikarin di şeva zîfafê da bi ser kevin.

Berbû/Berbûr/Porsipî: Ew jina ku ji bo rêberî û rêberdanê bi bûkê ra diçe mala zavê. Berbû jin in. Carna ji yekê zêdetir dibin. Berbû ji bo xemilandina bûkê jî dixebitin.

Serberbû/Serberbî: Navê ew jina ku bûkê dixemline. Ji yekê zêdetir berbûr hebin, ew serekê wan e.

Şoşman: Ew kesê ku şeva zîfafê ji zava ra rêberiyê dike.

Pîştderî/Xelaya pey berî: Xelata ku ji aliyê xwişk yan jî birayên bûkê, ji bavê zava tete xwestin û girtin.

Pêşkêş/Bexşîş/Xelat: Dema ku bûkê ji mala bavê wê dibin, ji aliyê hinekan ve rêya wê bête birrîn, xwedî dawetê (bavê zava) ji bo rê vekirine hinek perre didine wan, ku ji wî ra dibêjin bexşîş.

Xwendîtî: Xwendiyar piştê ku bûk anîn û nanê dawetê (tirşik) xwarin, her kes li gora qeweta xwe ji bo alîkariya xwediyê dawetê (bavê zava) hin pere didne berhev, ku ji wî ra dibêjin xwendîtî.

Bêj/Beş: Eger ji bo aşiqan kêr pere were berhev kirin, ji aliyê xwendiyar ve ji bo wan pere tete berhev kirin, ji vana ra dibêjin bêj.

Heqê zengûyan: Dema ku bûkê bi mayîne (evro zêdetir bi texsiyê ev îş dibe) dibin ber deriyê zava, bûk lingên xwe ji zengûyan dernaxîne yan jî ji mayîne peya nabe. Ji bavê zavê xelatekî dixwaze ku ji vê xelatê ra dibêjin 'heqê zengûyan'.

Mewlûd: Dixwaze feqîr be yan jî dewlemend, her kurdekî ku dawet çêke, piştê dawetê mewlûda xwarinê didin.

Paşperde/Gerdeke/Zîfaf: Dema ku bûkê binin mala zavê, wê rojê piştê çend set şunda dawet diqede û xwendî belav dibin. Di wê rojê da mara bûk û zava tete birin. Piştê mar birîne, şeva pêşin ya ku bûk û zava dê bi hev ra biborînin, ji wê ra dibêjin 'şeva paşperde'.

Zeyî/Rî: Piştê ku bûk sê çar roj yan jî heftekî li mala zavê da ma, diya wê tete ji bo çend roj yan jî heftekî wê bi mêvantî dibala mala bavan. Ji vê yekê ra dibêjin zeyîtî.

Nûmal: Keç û xortên ku nû bizewicin, malekî nû ava bikin, ji wan ra dibêjin nûmal.

Gotinên merivatî yên ku bi "keç xwestinê" peyda dibin.

Zava: Xortê ku nû bizewice, li gora malbata keçikê dibe zava.

Bûk: Keça ku nû bizewice, li gora malbata lawik dibe bûk.

Xezur/Vistewre: Ji bo zava navê bavê bûkê ye. Ji bo bûkê jî navê bavê zava ye.
Xwesî/Xwesû/Vistirî: Ji bo zava navê diya bûkê ye. Ji bo bûkê jî navê diya zava ye.

Bûra: Ji bo zava navê birê bûkê ye.


Tî: Ji bo bûkê navê birê zava ye.

Gorim: Ji bo bûkê navê xwişka zava ye.

Balduz: Ji bo zava navê xwişka bûkê ye.

Jintî: Ji bo bûkê navê jina birê zava ye.

Bacenax: Ew kesên ku bi du xwişkan ra zewicî ne, dibin bacanaxê hev.



Ferheng – Vajname'yê

(KURMANCÎ - HEWRAMÎ - DÎMİLÎ - SENENDEJÎ III)

ABDURRAHMAN UÇAMAN - SEÎD VERROJ

H

HADÎSE

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DİMİLÎ	SENENDAJÎ
HADÎSE	wey	hedise	wey
-	qort	gure	qort
HAL	hal	hal	hal
Jîn	-	-	jîwar
HAR	har	har	har
HARÎ	harî	harê	harî
HATÎ	ciyew dimay	rojê ki bêrê	abene
paşnûke	ciywe lay	-	lêrewela
-	-	lêrewela	-
-	-	-	lemewsa
-	-	-	lemeduwa
HAVÎN	hamin	amnan	tawsan
-	-	hamnan	-
HAYDARÎ	hagayî	haydarê	agayî
xeberhay	hay	xeber	xeber
-	-	-	hewal
HEBAN	manî	tewreyo çermeyin	hewane
hemban	-	-	-
HEBÛN	biyey	biyaye	bûyin
-	-	-	hestî
HECAM KIRIN	wirluşan	hecematî kerdiş	ba keşkerdin
-	horluşan	-	-

HEÇ

KURMANCÎ

HEWRAMÎ

DIMILÎ

SENENDAJÎ

HEÇ
HEDS
nîşka da zanîn
-

hêç
hako
-

hêç
nişkavara zanayîş
-

hêç
hako
mezene
xote

HEFTE

hewti

hewte

hefte

HEFTER

berge
werge
-

taqet
hêz
-

taw
tewîşt
berge

HEJANDIN

cimnay
cemay
-

leqnayîş
tênayîş
-

leqanin
cimyan
cimîn
ciwîn

HEJIK

pilaş
xişol
pûş û palax
qirş û qal

puş
pilaş
hejgî
şexel
-

puş
palax
xişle
pûş û palax
qirş û qal

puş
pilaj
hajal
hejik
pijal

HEJÎN

tekan
cimay
-

leqayîş
têşanyayîş
-

tekan
cimyan
cimîn
ciwîn

HEL

axel
exel

gemr
peran
gelexan

gew
axur
hewş

gemr
peçe
meraxul

HELANDIN

tawnay
-

helênayîş
-

tawanewe
tawandin

HELGIRTIN

pezenaz kerdeyi
-

hewanayîş
berzkerdiş
wegrotiş
-

enoxte kirdin
niyate kirdin
ko kirdin
note kirdin

HELHATIN

beramay

vejyayîş

helhatin

Ferheng - 'ajname'ye

HELM

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HELM	helmî	hilm	hilm
buxar	bux	box	buxar
-	tem	cîf	tem
-	tep û du	tef û di	tep û du
-	-	mij	bux
-	-	-	mij
HELQE	helqrêz	helqe	helqerêz
çengel	-	çengal	çift
HELWELA	helwela	helwela	helwela
lêgerîn	-	bide geyrayîş	-
HEM	hem	hem	hem
-	yiş	-	yiş
-	yiç	-	yiç
HEMAL	kolkêş	hemal	kolkêş
-	kolber	-	kolber
HEMPA	hewta	hempa	hewta
hevta	-	seycê	-
HEMŞERÎ	hemşerî	hemşerî	hewşerî
HEMÛ	gird	heme	gişt
hemî	-	pêro	-
giş	-	-	-
gişt	-	-	-
HENE	xene	hene	xene
HEREKET	cim û cor	hereket	cim û cole
cim	cim	rayir kewtiş	cim
-	cole	-	cole
-	-	-	cims
HERÊ	erê	erê	erê
erê	a	e	a
belê	belê	belê	belê
-	em	-	em

HERĒM

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HERĒM navçe	serzemîn -	mewqî -	serzemîn navçe
HERÎ	pejm	peşm	xûrî
HERMÊ hirmî	miroy -	miroy himroy	hemro golawî
HERZE sivik cilq çors çiklirû qird	qirt siwik silf - - -	celq sivik - çors - -	herze siwik cilf cird - qird
HESAN	hesan	kerra seqênayîşî	hesan
HESKIRIN	hes kerdey	hes kerdiş	his kirdin
HESP -	esp -	estor bergîr	esp navçe
HESTIR qatir	hesere -	qatir -	hêstir qatir
HESTÎ	pîşe	kate	pîşe
HESÛ	asu	-	ufuk
HEVSAR	hewsar	hewsar	evsar
HEVAL -	refîq -	enbaz hembaz	refîq -
HEVĒRDE destgiran mitmite	- - -	destgiran - -	dakirsiyan dakiryan -
HEVIRDE	kerewale	karit	kerewale
HEVÎR	hevîr	mîr	hevîr

HEVNASÎ	KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HEVNASÎ	HEVRINE	HEVRÎŞIM	HEVTONE	HEWAR
HEVRINE	HEVRÎŞIM	HEVTONE	HEWAR	HEWEN
HEVRÎŞIM	HEVTONE	HEWAR	HEWEN	HEWES
HEVTONE	HEWAR	HEWEN	HEWES	HEWÎ
HEWAR	HEWEN	HEWES	HEWÎ	HEWM
HEWEN	HEWES	HEWÎ	HEWM	HEWR
HEWES	HEWÎ	HEWR	HEWR	HEWRÊ ÇAV
HEWÎ	HEWR	HEWRÊ ÇAV	HEWRÊ ÇAV	HEWR GÛRÎN
HEWM	HEWRÊ ÇAV	HEWR GÛRÎN	HEWR GÛRÎN	HEWRAYÎ
qef	HEWRAYÎ	HEWRAYÎ	HEWRAYÎ	HEWŞ
marute	HEWŞ	HEWŞ	HEWŞ	HEYF
HEWR	HEYF	HEYF	HEYF	tol
HEWRÊ ÇAV	tol	tol	tol	cûrm
gerd	cûrm	cûrm	cûrm	
HEWR GÛRÎN				
HEWRAYÎ				
HEWŞ				
Hefş				
HEYF				
tol				
cûrm				

HEYF

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HEYF mixabin	heyf -	heyf -	heyf -
HEYKEL	heykel	heykel	heykel
HEYZERAN (celebek dar) heyzeran		heyzeranêr	heyzeran
HÊDÎ aram lemkir yawaş - - - - - - - -	hêmin aram wirîng yawaş nerm seroxî men ehwen weqre bêçirke sirewet piske -	hêdî nerm wirdî yawaş giran - - - - - - -	hêmin aram wirîng yawaş nerm sexwî men espayî werqe bêçirke sireft Paçirkî seqem
HÊDÎ HÊDÎ bere bere - -	were were - giran giran -	vera vera hêdî dêdî giran giran wirdî wirdî	were were bere bere - wirde wirde
HÊDÎKIRIN - -	xenexin singesing -	hêdî kerdiş hêdîka yewaş kerdiş	xinexin singesing -
HÊJA -	layiq -	layiq ercyaye	layiq -
HÊ JÎ	hêşteyr	hema zê	hêšta
HÊJÎR încîr	hencîr -	hencîr încîl	hencîr -
HÊL rû la - -	rûwe lan la dim tenîşt	rî kinar kişt - -	rû lan la diw riwe

HÊL

KURMANCÎ

HEWRAMÎ

DIMILÎ

SENENDAJÎ

HÊL

cîhet

ber

alî

HÊLDAR

landar

HÊLÎN

-

-

-

HÊNIK

honik

HÊNIKÎ

hênikayî

HÊRAN

HÊRAYÎ

HÊRE (made)

HÊRS

-

-

HÊSA

-

-

-

HÊVÎ

teka

rica

-

HÊZ

taqet

-

-

-

sebare

cîhet

-

-

terefdar

langîr

hêlanî

Liyani

-

-

fênik

-

fênikî

-

asaw haray

harya

eşqeme

hurs

pîş

man

asude

sunge

perdewûj

-

lale

xahiş

-

-

hêz

taw

tawêşt

tewan

werge

hêl

kişt

ver bi...

heta

terefdar

mêlkerdox

halên

-

-

-

honik

-

honikî

-

tahnayîş

tahnaye

vêre

hêrs

-

-

asan

rehet

-

-

hêvî

aduw

rica

-

hêz

taqet

-

-

-

sebare

cîhet

ret

şun

terefdar

langîr

hêlane

lane

aşiyane

kolane

fênik

-

fênikî

fênika

harin

haryak

gedeg

hurs

pîş

man

asude

sunge

perdej

wecan

lale

têka

xwahişt

pare

hêz

taw

tawêşt

tewan

berge

HÊZDAR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HÊZDAR bi hêz	wergegêr aza	bi hêz bi qewet	bergegîr bi hêz
HILBIJARTIN bijartin navgirtin -	werçîneyey hurçîneyey - -	vijênayîş helçînin - -	helbijartin helçînin helbirijin bijînin tel kirdin
HILKIRIN	horkirnay, werkirnay	hewanayîş	dakiryan
HINARTÎ elçî peyk şandî	remekî - - -	qasid elçî - -	remekî elçî rewekî -
HINDÊ -	nextê -	nextê hind	tawe -
HINDIK kêm piçdok hin nifş par -	next tozale koçyo tozlanyu rêzlanyu kot pare -	nextik kemî - tayneki misqalek çilkê -	nextî kêm enik tozî rêzlane çilkî rêze tozlane
HINDIK HINDIK	next next	next next	nextî nextî
HINGIV dobe	hengiwîn -	hengimên -	hengiwîn sehoh
HINDIR nav -	zere rêz dilê -	zere navên pîze miyan	zere naw pîze rêze

HIRÇ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
HIRÇ	herç	heşe	heşheş, wirç
HIRRÎN hişîn	şirixe -	hîrayîş hişayîş	nîx nirixe
HIŞ bîr	hoş wîr	hiş vîr	hoş bîr
HIŞK - -	wîşk zirr reçîle	wîşk - reçreq	wîşk zirr reçle
HIŞKAYÎ (hewayê sar ê sayî)	- -	seqem wişkayê	eyaç -
HIŞYAR hayî aga - -	werya hayî haga heşyar bahoş	şiyar hayî hayig - -	werya xewer aga - bahoş
HÎM temel binaxe	binerd binçîne -	binyat temel -	binerd binçîne -
HÎNBÛN fêrbûn fêrbûn	desemo - -	musayîş bonder biyayîş -	desemu lênî -
HÎNKIRIN hokirin fêr kirdin	fêr kerdey muçyarî kerdey -	musnayîş bonder kerdîş -	fêrkirdin muçyarî kirdin amuçyarî kirdin
HÎRO* hîlo hermele	hermel - -	hîro - -	helmele - -
HÎS -	hîz hana	hîs -	hîz hana

* Navê cûrekî giya.

HÎV

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SĒNENDAJÎ
HÎV	mange	meng/m	meng
-	-	aşm/m	-
HÎVANE	mangane	mengên	mangane
mehane	-	aşmên	-
HOLANÎ	lelokan	zirnaqop	helokan
çamiçir	-	-	-
HOGIRÎ	xwehî	hogirê	xwehî
-	xûdî	hembazê	-
-	xwi	-	-
HONAN	lul	lul	lul
honayî	kirj	tadaye	kirj
-	pêç	pêşte	pêç
HONANDIN	riştey	riştiş	çinîn
-	tenay	muntiş	tawdan
-	çîneyewe	-	honîn
-	-	-	tenîn
HOSTA	mamusa	hosta	mamusa
westa	wisa	westa	siwa
ûsta	-	osta	usa
HOV	gewç	hov	gewç
gêl	gêl	-	gêl
gêj	sepol	gêj	sepol
xînt	lajik	xînt	lajik
kewden	kewden	xêv	kewden
-	hepş	-	hepş
-	-	-	kiwêrhoş
-	-	-	teploz
HURÊ ZAD	rêzewil	wirdî zadî	rêzewil
HÛRIK	wird	wirdî	wirde
hur	xake	-	-
pirêj	piriş	-	piriş
rêje	rêj	-	rêj

HURÎ				VIH
KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ	KUR
HURÎ paça	eşqem	paçe (kelpaçe)	gadik	VIH
HURKIRIN hêran	hardey wirdî	kerdiş tahnayiş	harîn -	HIVANE mebaş
HUT hêwî nem	çewr nem -	hut nem -	şo nem -	HOLANI camkîr kîw
HÛCUM êriş -	pelamar horoş -	hûcum - -	pelamar horoş şatal	HOGRI HONAN honyê
				HONANDIN
				HOSTA
				HOV
				HURÊ ZAD
				HURIK

I-Î

INQILAB

KURMANCÎ

INQILAB

-

-

ISTÊR

sitêr

ISTIR (istirên çava)

IŞKEVA

fetîr

IXTIYAR

-

ÎCAT

nûvedan

ÎFADE

ÎFTÎRA (nebûnên

ku ji wan nebaşiyên
mezin çêdibin)

ÎHTÎYAC

niyaz

-

ÎNANE CIH

bi cih anîn

ÎNSAN

mirov

-

IRS

mîrate

-

HEWRAMÎ

pêşîwe

ajawle

aşu

hesar

-

-

fetîr

-

extiyar

deselat

ardeyne

enardey

fêz

pen

-

-

îhtiyac

ewce

kel

beyakî ardey

-

însan

beşer

-

îrs

-

-

DIMILÎ

inqilab

-

-

estare

-

-

hesrî

fetîr

işkeva

heşkeva

extiyar

hilek

pîr

îcat

-

îfade

îftira

nege

bohtan

îhtiyac

hewce

-

bi ca erdiş

-

însan

beşer

mêrdim

mîras

-

-

SENENDAJÎ

pêşîwe

ajawle

aşu

hesar

-

-

awdîde

fetîr

helnehatik

extiyar

deselat

dahawirdin

-

fêz

pen

efra

-

niyaz

ewce

kel

bicîh hawerdin

be cîke hawerdin

însan

beşer

adem

îrs

mîratî

cîmak

ÎSAL

KURMANCÎ

HEW RAMÎ

DIMILÎ

SENENDAJÎ

ÎSAL

îsal

emserr

îmsal

emssal

-

-

-

ÎSTÎRAHET

siyaywe

arisayîş

wiring

bêdan

wiçan

boy girotiş

wiçan

hêsayî

-

-

-

ÎŞEV

îmşew

emşew

îmşew

ev şev

-

eşew

(îstir (istir-şev))

ÎŞKARŞOL

kar

kar

kar

xebat

hermane

xebat

-

ÎŞLIG

giçî

îşlig

kiras

J

JAR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
JAR (muhtac)	atac	matac	atac
xizan	desteng	desteng	desteng
feqîr	-	feqîr	dest xalî
-	-	xizan	-
JAJRÛN	qîmaxe	malêz	qîmaxe
malês	-	malês	ardurûn
JEHR	zehr	zehîr	jehr
jeqîn	jeqen	jahr	jeqen
JENG	jeng	ceng	zeng
zeng	belx	zeng	belx
zengar	-	zengar	bar
pas	-	cengar	-
JÎ CÎ DERKETIN	berşîyey	cara vejyayîş	derçûn
derçun	-	-	-
JIMAR	jimar	ûmar (ûmartîş)	şîmarîş
hejmar	-	hamortîş	-
ejmar	-	-	-
JIN	jenî	cenî	jin
JINANE	jinane	ceniyê	jinane
JINBAB	dêdî	mêrrî	bawejin
damarî	-	-	-
JINBIRA	birajînî	biracênî	jinbira
birajin	-	cenîya biray veyy	birajin
JINBÛN	bin pijiknay	cenî biyayîş	bin pijanin
libandin	-	ceniyê	peraninewe
jintî	-	-	jintî
JÎ ŞÎR GIRTIN	beriyade	şit ra aqitnayîş	birînewe
şîrvekirin	-	şit ra birnayîş	-

JÎ

KURMANGÎ

HEWRAMÎ

DIMILÎ

SENENDAJÎ

JÎ

-

-

JÎR

zana

firrezan

zorzan

serwext

JIYAN

jîn

-

-

JIYANÎ

jîwar

JUJÎ

jîjo

ca

yiç

îtir

jîr

zana

firrezan

-

-

jîway

jînegî

zînganî

jîyo

zînganî

jîwar

jujo

-

zê

zî

-

jîr

zanaye

zaf zanaye

-

-

heyat

-

-

-

heyatî

-

dije

-

ca

yiç

îtir

jîr

zana

firrezan

-

-

jiyan

jîngî

zînganî

-

zînganî

jîwar

jujo

teşî

K

KA	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KURMANCÎ	ka	simer	ka
KA	ka	-	-
-	simerî	-	-
KADÎN	kadan	merek	kadan
-	-	simzor	-
KAL	kal	kal	kal
xav	-	-	-
KAN	kan	çime	kan
serkan	-	serçime	-
çavî	-	-	-
KANKIRR	kakîle	didanê sekuy	kalîle
xirya	-	-	-
KAP	kap	kab	kap
KARIK	bizle	bizêk	kidê
-	-	-	kar
KARTÎX	meber	dorpî	more
Dûrpî	-	-	-
KAVIR	were	verrek	kawir
berx	retewî	berx	berx
-	puş	kavir	puş
KARBIPÎR	konekar	pîrê karî biyayîş	konekar
karbicî	qeyre	-	qeyre
KARWAN	karwan	karwan	karwan
-	herbene	-	xereqçî
-	-	-	xerekdar
KARXANE	karxane	karxane	karxane
-	-	febrîqa	-
KASIK	kase	dêzik	kase
dêzik	çamle	-	camule

KEÇ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KEÇ	kinaçî	keynek	kinaçî
qîz	-	çenek	kinêsk
zerî	-	-	-
KEÇEL	keçel	keçel	keçel
KEÇIKANE	kinaçane	keynekê	keynişkane
keçane	-	xanimê	-
KEÇÎTÎ	kinacı	keynekî	kenişik
keçinî	-	-	-
KEÇMAM	mamoza	datkeyna	amoza
KEÇMET	metyeza	emkeyna	mîmkeza
KEÇXAL	laloza	xalkeyna	xalozak
KEÇXALTÎ	mêteza	yaykeyna	mêmkezak
KEDÎKIRÎ	fêr biye	destî kerde	amuxte
keviyî (kedibûyî)	liynîşî	destî	liynîyî
fêrbûyî (fêlbûyî)	-	-	fêr
ehli	-	ehli	goru
KEDXÛDA	kêxa	wayîrê keyî	kêxa
-	-	wayîrê dew	mîredê
KEF	kef	kef	kef
KEFEN	kefen	kefen	kefen
-	xelat	-	xelat
KEFGÎR	besê	kefgîr	kewgîr
KEFÎ	qoçke	kafya	qoçke
-	-	-	moçaq
-	-	-	kilawqij
KEFTAR	kentar	keftar (namey	keftar
gorken	-	yew heywanî)	gorkenke
hewtiyar	-	-	kentar

KEHRÎBAN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KEHRÎBAN -	kareba zerdî	kereba kehrîban	karîba zerdî
KEKÊ -	kake -	keko kekê	kake -
KEL ⁽¹⁾ fehl kele	tige fahl -	kel ameyîş fahl -	kel fahl -
KEL ⁽²⁾ coş furîn	qol coş -	kel/m - -	qol coş kol
KELA barga kele saray derbar beden	barga derbar - - - -	dizi kela - saray - beden	barga baru derbar erik burc -
KELEK - -	kelem - -	kelem - -	kelem kercê belem
KELEM	kelem	kelem	kelem
KELEŞ şerker cengî	cengî - -	keleş şerker cengçî	cengî - -
KELÎ keliyay piyyay pehtî	girya - - -	giryaye kelyaye pewte -	kolyak - - -
KELÎME	kelîme	kelîme	kelîme
KELÎN - -	giriyay - -	giriyayîş kelkewtîş -	kolyan qolyan helqolyan

KELMÊÇ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMİLÎ	SENENDAJÎ
KELMÊÇ	aw wilotî	çillm	awlot
-	-	çillmî	çelm
KELYAYÎ	kole	kelyaye	qole
KEMANÇE	gireway	giyaye	kemançe
KEMAV	kemançe	kemançe	kemançe
-	-	kemaw	tengaw
KEMER	-	tengaw	-
-	kemer	wêraw	kemer
-	kelek	kemer	kelek
-	suxme	-	suxme
-	kule	-	selte
-	-	-	nawqew
KEN	zeqe	huy	zeqe
-	tiriqe	wiy	tiriqe
-	pirike	-	kene
-	-	-	xene
KENDAL	ken	kend	kenaw
-	dirnal	kendal	awderke
KENGÎ	key	key	key
KENYAN (alê kêf)	xeneran	rî huyaye	xeneran
-	-	rî wiyaye	-
KEPEK	kerkêfe	kepek	kerêkêfe
kapek	-	-	pelx
KEPENG	ferecî	kepeng	kepeng
kepene	-	-	-
KEPIR	kerêkêfe	kepek	kerêkêfe
holik	herzele	holik	herzel
-	-	herzele	kolît
KER ¹	her	her	ker
-	çaş	her/m	çaş
-	welax	welax	wilax
-	olax	-	tor

KER

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KER ²	kot	lete	let
kerî	têke	dîlim	têke
dîlim	diyar	-	diryak
parçe	-	parçe	kol
pare	-	-	pel
pirtike	-	-	tilîşyak
KER ³	-ger	-ker	-ger
-van	-	-kar	-
-wan	-wan	-wan	-wan
-çê	-çê(çî)	-çî	-çê/çî)
KERB	ketre	keder	ketre
pert	helêt		helêt
pelêt	pelêt		
KERBEŞ	sewzxxer	gother	sewzîxer
-	-	-	pêşxer
KERÎ	mêgeli	kerî mêşnan	mîgel
birr	-	xaroşe	-
KERÎ	tolaşe	kerî	tolaşe
-	demetrîş	-	demetrîş
-	-	-	tiraşe
-	-	-	taşe
KER KER	perçe perçe	perçe perçe	piçir piçir
kerî kerî	şir û wer	lete lete	şir û wer
pare pare	helar	-	helar
parçe parçe	şir	-	şir
-	-	-	dawesyak
-	-	-	rêpal
KERMOZ	xerengere	meysa heran	xerengez
KERKOTIK (şehê tevnê) gizerkî		kerkît	kelkîr
KERPÎÇ	acur	kerpîç	acur
-	kolosin	-	kolo
KERR	kerr	kerr	kerr
-	-	-	nejnewa

KERENG

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KERENG	kengerî	kenger	kenger
KEŞAWERZ	keşawerz	citêr	keşawerz
cotkar	hêşyar	-	-
berzyar	werzên	-	berzger
cotyar	cotyar	-	-
KEŞE	keşe	keşe	keşe
KEŞKOL	keşkol	pêlek	keşkol
-	beyaz	tewre	beyaz
-	-	torbik	-
-	-	parzim	-
KETEN	ketan	keten	ketan
KETIN	kewteyre	kewtiş	keftin
-	daryanewe	ero gunyayiş	daryanewe
-	gîlêray	kewtiş ero	gilyan
-	hurdaryay	-	dakeftin
-	-	-	rimyan
KETI	era kewte	era kewte	dakeftin
keftî	-	kewte	-
KETI	duçar	kewte	duçar
şerpeze	toşyar	şerpeza	toşyar
bêgav	awqe	girewta	awqe
bêwayik	gêrude	bêwayir	gîr
-	-	-	pagîr
KEWANÎ	keywanu	kewanî	keywanu
binevan	binewan	kevanî	kedbanu
-	çaştker	kebanî	aşiyes
KEVCAL	qirjangî	kerakînc	qirjang
qijmale	-	-	-
KEVÇÎ	çemçe	kewçik	kewçik
-	-	-	çece

KEVIR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KEVIR	kewerke	kera	kewerik
ber	-	ber	-
kûç	tewene	kûç	kûçik
zinar	-	zinar	-
-	-	hîm	-
-	-	ssî	-
-	-	salî	-
-	-	taht	-
KEVIRÊ AKSÊ	tewenefrî	şeylî	pelefirî
beranî	-	-	pelefirkî
KEVN	poya	kihên	pertukîyak
-	fertut	keyen	fertut
-	-	kevnar	daruzyak
KEVOK	kawetrî	boran/m	kotir
-	-	bewran	
		kewter	
KEVROŞK	-	hergu	-
kêrgu	-	herguş	-
-	-	aroş	-
KEW	jerejî	zerreneg	kew
KEWAR	kenu	kuwarî	kenu
kuwar	-	-	-
xilêf	-	-	-
KEWNÊR	beq	dîk (zerrenco nerî)	beq
-	-	-	nêrkew
-	-	-	padaw
KEYF	keyf	keyf	keyf
xweşî	weşî	weşî	xweşî
KEYS	perdewî	va bide ardiş	perdêj
firset	pa	firset	pa
ba lêhatin	-	-	pile
-	-	-	hel

KÊÇ

KURMANCÎ

HEWRAMÎ

DIMILÎ

SENENDAJÎ

KÊÇ

kekî

keki/kek

kêç

KÊM

laykem

kemî

laykem

-

-

tayn

-

KÊM KÊM

kem kem

kemî kemî

kêm kêm

hindik hindik

hela hela

tay tay

endik endik

piç piç

nexte nexte

next next

next next

-

-

piçu piçu

toze toze

-

-

-

rêze rêze

KÊMKIRIN

pajîne

kemî kerdiş

pajîne

-

çiroçin

-

-

KÊRIK

kordî

kardya wîrdêk

çeço

şîlf

-

şîfl

-

çeko

-

şiv

-

KÊŞAN

kêşay

kaşkerdiş

kêşan

kaşkirin

-

-

-

kêşandin

-

antiş

-

KÊŞAN

kêşay

antiş

kêşan

lênîyan

kelday

keldayîş

-

-

-

gadayîş

-

KÊŞANDIN

tekeday

kaşkerdiş

dekedan

keldan

kelday

keldayîş

keldan

danekel

hête

gadayîş

-

KÊZÎN

persa

awzê

pirsa

avzê

kucaw

binvay

bincu

kucva

-

-

kunav

KIBRÎT

kibrît

kibrît

gogird

şixat

-

miftik

-

KIL

kile

kil (kila çiman)

kil

-

-

-

kile

KILAN

jay

nîrtîş

jendin

kilandin

şileqanîn

-

-

keyandin

-

-

-

KILANDIN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KILANDIN	kildan	kildan	kildan
KILÊN ttewq	kelen ttewq	ttewq	kelen ttewq
KILÎT qûfil	kûfil -	kilît keseg	qûfil açar
KILÎM berr, cacim	kilîm ley	kilîm	kilm berr, şalîne
KILKEŞAN -	reştey -	kil kerdiş -	riştîn rijtîn
KIN kurt qût -	kul kota baqaquret werdegîle	kirr qol - -	kul kota bawequret simexurte
KIRAS -	helawe -	kiras pirên	cawik -
KIRESE MERR	kaj	pirênê marrî	kaj
KIRASŞO delakxane -	delakxane - -	- - -	delakxane arayışga selmanî
KIRÊÇ	geç	kirêç	geç
KIRÊ îcare	îcare -	îcare kirya	kiraha -
KIRÊ GIRTÎ ecîr -	kiraha girya - -	kirya girote - -	ecîr mizur mizber
KIRÊT(keferat)	negbet	xelat (xelay)	negbet
KIRÎVE tufan gilêle xilêle	bawe şiwe - -	va û vakur tofan firtone -	kirîwe silîwe badewe -

KIRRÎN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KIRRÎN	esay	erînayîş	-
KIRRKIRRE (sêvê bin erdê)	gizerkî	silqî (sayekî bindê erdi)	sêv binerd
KIRS zêr û zibil - - -	dexel zêr ziwêl puş û pelax xak o xol pajîne	dexel gen û gemar puş û palax qirş o qal -	dexele zêr û ziwêl puş û pelaş xak û xol pejîne
KIRYEVE biyeve dev jê berdan jê gerîn -	kiryaw waz wela tak -	fek tira veradayîş - - - -	kiryawe waz berela tak taq
KISPIK - -	morekewle kilane -	kûspik - -	moriker kilaney kewik
KITABÎ xwendekar	qûtabî -	telabe wendox	qûtawî -
KIZ zebûn	kiz zebûn	krewte şelpeze	kiz zebûn
KIZÎR -	kizîr pakar	kizîr -	kizîr -
KIZRIK kizik	çizlik -	kizrik -	çizlik -
KÎ kîja	kî kam	kê kam	kî kam
KÎL - -	here lête -	kîl - -	herik lête qur
KÎM kêm nêm edap	zox kêm - -	rrêm - - -	zox çilk - -

KÎN	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KURMANCÎ			
KÎN	qîn	kîn	qîn
-	man	-	man
-	pîş	-	pîş
-	-	-	xezew
KÎR	kîr	kir	kîr
KIS	manî	kîs	hewane
kîsik	-	kîsik	-
KÎSE	kîse	kîse	kîse
KITIK	çilme reqe	gî pirnik	çilme reqe
-	kemêle	çilma wişk	kemîle
KITRE	peyaze	cîy (coy)	peyazik
KOÇEK	reqas	reqas	reqas
-	-	koçek	-
KOD	koçe	kod	koçe
kodik	-	kodik	-
KOL	kol	kol	kol
KOLAN	kenay	kenayîş	kendin
kolandin	-	-	kenîn
KOLAN	dalan	qorîdor	dalan
qorîdor	-	-	-
poخان	-	-	-
KOLANDAR	dalandar	bergawan	dalandar
KOLEK	tilîş	-	tilîş
-	-	dolaçe	-
KOLOZ	home	kilaw	home
kope	-	-	-
KOM	kome	kome	komele
civan	koga	pêser	koga
hêwirin	-	-	paxwa

KOMEK

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KOMEK qelfe	desyar -	şagirt -	komek -
KOMEK hari (medet)	komek yarî	paştî waştîş -	komek yarî
KOMIR rejo rejî	zuxal xeluz -	komir - -	zuxal - -
KOPIK qule qulube -	pope qule - -	qulpe qule - -	pope qule sere kele
KOR	kor	kor	kor
KORAVEK qobî	zongaw zilkawî	çol -	batlaq zilk
KOSE	kose	kose	kose
KOŞIŞ (xebata - bi dil û can) xebat	xebata zerrda teqala telaş	sefîra - xebat	koşîş teqala telaş
KOTE gihîştîk	muçe -	wer (çî werî) -	muçe -
KOTEL	koter barîkî	koter	qûmrî
KOTEK lêdan lêxistin	kotek - -	kotek kûtiş pirodayiş	kotek - -
KOVARIK kakovîk	helçî -	qapîrek -	qarçîk -
KOVIK mastêr	rehtî -	mastêr -	rehtî -

KOVÎ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KOVÎ bîyanî	koyî kolî	kovî -	kêvî bîyawanî
KUR	qul	xorîn	qul
KURE	kurê	kure	kure
KURÎ - -	qulî çalî -	xorîné - -	qulî çalî qewdî
KURT birrî -	nîmeçil birrya -	nêmcet beryye -	nîmecil piçiryak kurt
KUSÎ sinik kuştin	kîsele sun kuştey	kesa/e kiştîş	sin kuştin
KUŞTÎ -	kuşya topyak	kişte -	kujyak -
KÛÇE -	kûçye kolan	kûça -	kûçî kolan
KÛÇIK kanun tifik ciagir	awîrga eyîrga ocax -	kûçlan kanun kûşlan -	kiwang golge ocax -
KÛDUN kuzik	xitlî xuruk	kuzik -	xitkî xuruk
KÛFTE	kûfte	kûfte	kûfte
KÛL kûner rênc rij	dimel - - -	kûl rêş - -	dimel dûmel made pêgin

KÛLAV

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KÛLAV	kil	kûlav	kûlav
rêsik	par	-	kil
-	-	-	dese
-	-	-	par
KÛLEK	kilawrojîn	paja	konaroçke
pace	rojîn	paca	konawece
pencere	-	-	derpiçe
KÛLEMEK	kefel	lûlêmek	kefel
kefel	simt	-	simt
-	wilwe	-	wilwe
KÛLING	zengel	zegne	qolinge
		difek	
KÛLÎ	pakure	mele	kule
KÛLM	lamişt	kûlm	lagiwêl
KÛM	taqîle	kilaw	teqle
KÛN	wile	qûl	kûna
qûl	-	lon	-
KÛNBET	qûmez	qube (qubey camî)	gûmez
-	taq	-	taq
KÛNCÎ	kûncî	kûncî	kûncî
-	-	kûnce	-
KÛN KÛNI	wil wil	qûl qûlî	kûna kûna
qûl qûlîl	-	-	-
KÛRM	kûrm	karm	kûrm
KÛRMORÎ	miruçe	mijmewl	miruçe
morik	-	mijlewr	-
mîro	-	-	-
KÛRR	kûrr	laj (lac)	kûrr
-	-	gede	-

KÛRRANE

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
KÛRRANE	kûrrane	gedeyê	kûrrane
KÛRRE	go	ginda	kûrre
xirr	-	gûd	xirt
gog	-	gog	go
top	-lat a lat	top	girdelane
KÛRRÎ	kûrre	kûrrî	kûrre
sîpe	holper	-	holiker
dahş	-	-	kerkol
KÛRMAM	mamoza	datiza	amozak
kûrap	-	-	kerkol
KÛRRMET	mêteza	emiza	memkezak
		amiza	
KÛRRXAL	laluza	xaliza	xaluzak
KÛTLIK	dayne	kûfta	doyne
kûfte	-	-	-
KÛTUBIR	kûtubir	yewray	kûtubir
yekcar	-	hew	hew
KÛXIK	qoze	kûxik	qoze
-	-	-	qoxe
-	-	-	koke

L

HERĒM

KURMANCÎ

LA¹

tta

ben

nex

LA²

kenar

teraf

rex

tenişt

ber

hêl

kêlek

LAF

LAJE

goranî

serhewa

dilokî

lawje

saz

-

-

LALBÛN

-

LARÎKER

antronûr

LARÎ

repel

listik

leyztik

HEWRAMÎ

la

lo

-

-

lawlan

dîm

temuwe

-

-

-

-

-

huşe

goranî

hure

deng

mure

çolçir

deng

durçir

toytoy

tûrî

-

kayeker

-

kaylê

game

kilî

DIMILÎ

la

rişte

-

-

kişti

kinar

teraf

heta

-

ver bi...

-

-

qalê vengî

deyrî

lorikî

serhewa

dilokî

lawikî

-

-

-

lal biyayîş

ziwan qefilyayîş

kaydayox

-

kay

laj (lac)

gede

SENENDAJÎ

la

lo

-

-

lalan

to

temu

dêw

-

ber

-

-

huşe

haşe

lav

goranî

çire

-

mure

çolçir

dengdilanî

durçir

toytoy

turî

-

bazîker

bazîbaz

kaye

keme,

tepel

LARİ KIRIN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMİLÎ	SENENDAJÎ
LARİ KIRIN	kayli kerdey	kaykerdiş	kaye kirdin
LASTÎK	lastik	lastik	lastik cîr
LAT Û LOT (pîs)	lat û lot elo û cilo	gend û gemar pîs û herom	lat û lot elo û cilo
LAVAYÎ paryaneve têkhelyay	layanewe wêyawnayne	lebyayîş vera geyrayîş	layanewe paryaneve têkotya têperya
LAWAŞ labaş	lawaş	fetil (nano fetil)	lawaş
LAWIR candar	gîyandar	ganî gonî	canewer
LAWMET	metyeza	emiza	mîmkeza
LEC rrik	lenc	rrik	rrik lec
LEGAN	legan	legan	legan
LEGLEG	hacî leqleq	legleg	hacî leqleq
LEHÎM	lehîm	lehîm	lehîm
LEHÎ leyî laser lêmişt	lafaw	naser nasel	lafaw - laxêz lêzمام lasame
LEKE	leke	leke	leke
LELE -	lele	lele	lele tete
LELENGÎ tutik zingil kilorik	pişiyîy koliçî	lolik kilor zingil	pişî - - -

L

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
LENG	leng	leng (lengayîş)	leng
topal	koç	topal	koç
kûlek	-	sîqal	-
LENGERÎ	lengerî	lengerî	tebaq
şikevk	-	-	-
LERZ	lerz	lerz	lerz
-	çoq	-	çoq
LEŞ	leş	leş	leş
beden	laşe	beden	beden
can	enam	gan	enam
-	-	laşe	laşe
LEWAZ	lawaz	bêtaqet	bêhêz
çeqlte	çeql	bêhêz	çeqlte
-	ler	-	ler
LEWAZ	lerr	heywano bêtuk	qirxol
-	qirxol	-	belebarîk
-	çeql	-	çeql
-	reql	-	reql
LEWENDÎ	soranî	-	soranî
-	-	-	qoçikê
LEXAV	lexam	lexam	lexaw
-	-	-	dîyane
LEXT	lext	lax	lext
-	şil û fil	belate	-
LEYMUN	leymun	leymun	leymun
LEZ	pele	lez	pele
zu	-	rew	hele
LÊ ANÎN	nîyayser	pê ardiş	lênîyan
lê înan	-	pêşandiş	-
lênyan	-	-	-

LĒBANDIN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
LĒBANDIN	xelefnay	xapênayîş	xilafanîn
xapandin	-	xeletnayîş	-
rêbirneder	-	-	-
LĒDAN	daywane	darb	lêdan
kûtan	kûway	kûtiş	kûtan
-	weşay	-	weşanin
-	şanay	-	-
LĒ GERÎN	bazdîd	bide geyrayîş	bazdîd
pirsyar	persa	persayîş	pirsa
-	-	-	papey
LĒ HATIN	saznay	bide ameyîş	saziyan
-	saçnay	pêkewtiş	pêkeftin
LĒKDA	toşamay	wariştiş	helsan
hevra	toşyaraway	werzayîş	rasewebûn
tevda	-	-	berzepabûn
LĒLAV	lêlaw	lêlaw	lêlaw
şêlu	-	lêl	-
lîşo	-	-	-
lêtir	-	-	-
LEP	çaçole	hîle	çaçole
kelek	kelek	zexelê	kelek
zexelî	-	-	banbul
LĒP	fêl	teşxele	çaçule
teşxele	-	xelafnayîş	-
LĒP KIRIN	xilafnay	hîle kerdiş	xilafanin
-	-	zexeley kerdiş	xawanin
LĒPKER	hoqebaz	hîlebaz	çaçolebaz
kelekbaz	kelekbaz	zexel	kelekbaz
mizewir	mizewir	mizewir	mizewir
xapînok	fêlbaz	fêlbaz	fêlbaz
-	-	-	dawbaz

LÊV

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
LÊV	lews	lew	lews
limor	liç	-	liç
-	-	-	lîyo
LIB	rowalet	zurî	rowalet
şibhe	-	-	çap
derew	-	-	-
LIHÊF	hêf	lihêf	lêf
LIK	like	wesîn	lik
LIVA	berkin	liva	berkin
LIVANDIN	xiletney	kaydayîş	xiletanin
leqandin	-	leqnayîş	-
LI VIR	ew êge	wita	egre
li vêrê	êge	weyra	êre
li vê derê	,	weyra di/de	-
LI VIRA	age	ewta	eyne
lêre	cuge	tîya	-
-	ça-	-	-
-	çage	-	-
LI XWE DANÎN	amapine	mûkûrî	jêrçun
mûkûrî (îtîraf)	pincamay	-	pêhas
LÎM	lîm	dûrdî	lîm
binik	binxale	binik	libt
tort	çoq	-	çoq
tellp	cirm	tellp	cirm
littam	-	letton	limt
rittam	-	-	xilt
LÎWAN	lîwan	qedeh	lîwan
şuşe	aw werî	-	-
LOME	melûlome	lomê	menûlome
-	demko	-	-

LOQME

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
LOQME	tîke	loxme	tîke
parî	-	-	-
LULE	lule	lula	lule
borî	-	borî	lulîne
LULIK	meko	ginda	meko
maqara	-	miqara	-
makuk	-	makok	-

Seydayê Xanî û

Mem û Zîn

ABDURRAHMAN UÇAMAN

Ev lokalîne me ya li ser Seydayê Xanî û afirandinên wî, ji sê şaxan pêk tê:

- a) Seydayê Xanî kî ye?
- b) Afirandiyên wî çi ne?
- c) Bi wan afirandiyên xwe çi aniye ziman?

a) Seydayê XANÎ kî ye?

Ev diyare ku ji mêj ve gelek xwenda, roşinbîr, zana û hûnermend li ser vî Seydayê hûnermendê bi nav û deng lêger û lêkolînan kirine. Ez di vî bawarî da me, ku Seydayê XANÎ di vî 50-60 salên dawîn da pirtir ji wan sê esrên pêşîn hatiye naskirin û danaskirin. Bi kurtî malbata Seydayê XANÎ: Ehmedê kurê Îlyasê kurê Rustem e. Di sala 1651'ê da li gundê Xanasêgundan (navê gundekî nêzîkê çolemergê) hatiye dinyayê. Bernavê-XANÎ- ji wî gundî girti ye. Pêşiyên malbata XANÎ ji Herêma Botan çune wê derê. Seydayê XANÎ sala ji dayik bûna xwe di paşgotina Mem û Zîn'ê da bi van du malikan da-ye zanîn: Lewra ku dema ji xeybê fek bû / tarîx hezar û şêst û yek bû. (hicrî)

Ji gotin û nivîsanên XANÎ tete zanîn ku; XANÎ gelek tişt nivîsiye, bi tenê di kevneşopa medrese û tekyeyan da Nûbuhar, Mem û Zîn û çend beytên perakende bi dest me ketin. Ez gelek li pey diwana XANÎ geriyam min peyda nekir. Bi tenê yek beyteka wî ya çarane (çar malik) me peyda kir ku malîkekî ji wan bi Arabî ye, yek bi Farisî ye, yek bi Tirkî ye û yek jî bi Kurdî ye. Bi dîtina min, nivîsînên Seydayê XANÎ ne vana bi tenê ne. Lewra di paşgotina Mem û Zîn'ê dibêje: *“xetê te ye ser nivîst û sermeşq/sih sale xetê xeta diket meşq”*

Însanan kutipxaneyên Îskenderye, Bexda û hwd. şewitandin, bi milyonan kitab û afirandin ji li benda şewitandina xwe ne ku bibin duman û xwelî. Seydayê XANÎ xwediyê eşqeka mûcerred e, yanî ew eşiq û dengê wijdana mutlaq (serbixwe) e. Bêveqetandin û tercîh li ber nepakî û nerastiyan serhildanî kirî ye. Evan însanên ku eşqa wan mûcerred bibe, yanî ji amacên maddî û piçûk derkeve, ew bê şerm û tirs dajon ser zulmê, nerastî û nepakiyên ku bi dîtina wan; hinkî bi wan nepakiyan dêşin. Hela werin em binêrin da seydayê XANÎ di vî warî da ji bo pevçûna xwedê û Mlekê Tawis di dawîya destana Mem û Zîn'ê da çi dibêje:

“Îblisê feqîrê bê cinayet / hindî te hebû di gel înyet
her rojî dikir hezar taet / lewra ku te da wî îstîtaet
wî secde nekîr li xeyrê mabû / gêra ji ber derê xwe merdût
yek secde nebîr li pêşê exyat / qehra te kir muxelet dinar”.

Mawlana Celaledînê Rumî jî rûmeta însan di însanîyetîya wî da dibîne û wî bi însan bûyîna wî dipîve, ne bi dîn û bawerî û îbadet û mabudê wî, ew gazî dide însan dibêje: “were, tu çî dibî bibe were. cihê te li ba me heye”. Ewan însanên hanê piştî ku diçin pîr dereng têtin naskirin, hinkî li wan digerin lê ew êdî venagerin.

b) Afirandinên wî çî ne?

Seydayê XANÎ, di paşgotina Mem û Zîn’ê da bi xwedê ra xeber dide dibêje: “Xetê te ye ser nivîst û sermeşq-sih sale xetê xeta diket meşq”. XANÎ, di vir da dide zanîn ku sî sal e, ew dinivîse. Wekî ku me li jor got: nivîsînên Seydayê XANÎ ne tenê Mem û Zîn, Nûbuhar û Beyta Çarane ya bi çar zimanan. Dema ku XANÎ Mem û Zîn qedandiye, salên wî çil û çar(44) bûne. Di paşgotina Mem û Zîn’ê da dibêje:

“îsal gihşte çil û çaran/ wî pêşrewê gunehkaran”. Seydayê XANÎ, piştî nivîsana Mem û Zîn’ê jî çarde sal jiya ye.

Hûnermendekî wekî Seydayê XANÎ, bi Mem û Zîn û Nûbuharekî bi tenê li pey hiştina wî bes nayête dîtîn. Ez bawerim, eger di binê kewarê tekye, medrese, mizgeftan û hinkî şikeftan lêgerînekî baş bête kirin, dê gelek afirandiyên pîr hêjayên Kurdî bêtin dîtîn...

1. Seydayê XANÎ bi nivîsandinên xwe çend tişt bi hev ra dide zanîn; Bi “Mem û Zîn”ê xwediyê eşqa mecazî çawa para xwe jê digre, însanên netewîperwer jî jê xudanpar dibin, mûtesewûf û hûmanîst jî bi dîtîn û xwendina wê gelek dilşad dibin, ji ber ku XANÎ wan jî jibîr nekîrî ye. 2. Nûbuhar: Seydayê XANÎ, bi “Nûbuhara Piçukan” jî gelek tişt hînê zarokan dike: a) Ferhenga Arabî û Kurdî hîn dike. b) Bi gedan aruzê dide naskirin, di her du rûpelan da bahrekî aruzê rava dide û li gora wê bahrê ferhengê rêz dike. c) Di serê her bahrekî (nîfşê deryaya qafya pêvandî) du malikê ku adet û toreyên civakî hînê gedan dike. d) Di dawîya Nûbuharê da dîroka nivîsana Nûbuharê bi tiştanokî (mamîkekî) hejmarî tîne ziman. 3. Ji dîwana wî ew beyta ku bi çar zimanan li ser çarmalikan nivîsandiye, ew tenê bi destê me ket. Ewan çar zimanan: Arabî, Farisî, Tirkî û Kurdî ne.

NAMEKÎ EŞQÊ JÎ DÎWANA EHMEDÊ XANÎ

Fate ûmrî fi hewake ya habîbî kulle hal (Arabî)
Ah û nalem hem demem şûd der firaqet mah û sal (Farisî)
Ger benim kanım dilersîn çoktan olmuştur helal (Tirkî)
Dîn û ebter bûm ji eşqan, min nema aqil û kemal (Kurdî)

Ente fikrî fi fuadî ente ruhî fil cesed (Arabî)
Leşkerê gemhayê to mûlkê dilem wêrane kerd (Farisî)
Dade geldim aşk elinden isterim senden medet (Tirkî)
Wan Tataran birine yaxma aqil û dîn û milk û mal (Kurdî)

Tale gemî zade hemî şa'e sirrî fil mela (Arabî)
Teşne'ê camê wîsale m çun şehîdê kerbela (Farisî)
Yoksa sen diwane oldun nice halim ey dila (Tirkî)
Ya ji nû ve îşweyek da min hebîba çavxezal (Kurdî)

Bittû hacîren hebîbî lestû minnî alîme (Arabî)
Her dem ez derdî firaqet gâfilem ez halê men (Farisî)
Can û dilden arzî kıldım halimi canane men (Tirkî)
Ji arzîhala min tu xafil qet ne pirsî arzîhal (Kurdî)

Hel lana mîn nîmetî weslîl mîn nesîb (Arabî)
Ofitadem ber deret bêçare sergerdan gîrîp (Farisî)
Derdimin çokluğû senden öte yok hiç bir tabîb (Tirkî)
Ey tabîbê min dewayê derdê Xanî her wîsal (Kurdî)

(Me ev helbest ji berhevoka Zeynel Abîdîn girtiye)

c) Seydayê XANÎ vê destanê (Mem û Zîn), ji kî, çi xwestiye? Seydayê XANÎ, li dora xwe û li rûpelê pirtokan nihêrtiye; dîtiye ku eger hûnermendan ji wan însanên pey xwe ra hinkî berhem (mîras) nehiştana, dê di ciyê vê dinyayê da ewê dinyaka dî, bi çandeka dî dê hebiya. Eger Fîrdewsî ji Îraniyan ra Şeyhnameyê beş

nekiribûya; di nava wê da pêşiyê wan ravayê wan nedabûna, bi wan nedana nskirinê dê îro li kenarê Hezarê pêlên alên talankerên Araban bi pêlên Hezarê ra dilan bikirana. Eger hûnermendên wekî Yunis EMRE û Hacı Bektaşê WELÎ nebûyana, evro dê di Anadolê da kijan çand bikeliya û pêl bida? Weha reng e, îliada, Nibelungen û hwd. Piştî ku Seydayê XANÎ ji van destanan agahdar bûye, xwestiye ku ew jî destanekî ji gelê xwe ra pêşkêş bike.

Bi kurtî: Mem û Zîn, destaneka dîrokî ye, bi zimanê Kurdî bi zaravayê Kurmancî ye. Nivîskarê wê, hûnermendê mezin Seydayê XANÎ ye, di rû da çirokeka du aşiqê bi eşqa mecazî ye, lê bi rastî gaziyeke netewî ye. Seydayê XANÎ bi nevé Mem û Zîn'ê du tene aşiq û meşuq qefaltiye, evîna wan li gaziya xwe ya netewî pêçandiye. Lê dîsa jî evîna Mem û Zîn'ê wê gaziye ne nûxaftiye, wê gaziye di gelek ciyan da pêçeka xwe çirandiye. Seydayê XANÎ, ji xaliq û mexluq ra tevda tiştên nava dilê xwe rijandiye. Bi vî hawayê daye zanîn ku amac ji pêşkêş kirina vê destanê ew gazî ye, ne ku ew çiroka wê eşqa mecazî ye.

Di nava pêvajoka dîrokê da navê “DİYARBEKİR”

Ev bajarê dîrokî bi her hawayê li ber darbeyên dijwar da hatiye pelaxtin. Her dem ew rewşa wê ya dîrokî bûye babeta gengeşiyê. Em bala xwe didinê ku ev gengeşe li ser çêbûn û mana kelîma “Diyarbakir”ê jî hatiye kirin û hê jî berdewam e. Di vê babetê da, yanî li ser kelîma “Diyarbakir”ê gelek lêkolîn û pirtûk hatine nivisandin û gelek dîtin derketine holê¹. Ji wan dîtinan hinekan, li jêr hatine nivîsîn:

“Li gora dîtina hin dîroknivîsên Acem, Diyarbakir: Diyar+bikr, ew jî tê-te mana bajarê qîzan.

Ji ber ku kela “Diyarbakir” bi kevirên reş hatiye avakirin, dîroknivîsên Ruman navê wê danîne “Kara Amîd/Amîda Reş” (Bn. Şekvet Baysanoğlu, Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır, S.6).

Li gora dîroknivîsên Araban, ji ber ku qebîla (êl) Bekr-îbnî- Vaîl hatiye vê herêmê, bi mana navê vê qebîlayê, ji vê herêmê ra hatiye gotin “Diyarbakir” (Bn. Ş.B. Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır).

Ji dîroknivîsên Ermeniyîyan Horenî Movses waha dibêje: “Çend esir berê mîladê (B.M.), qabîlekî bi navê “Amed” ku şaxekî Ariyan bû, hate li başûrê Anadolê da li bajarê “Amed” da bi cî bû, ji vê qabîleyê jî malbata “Amadunî” çêbûne.” (Ş.B. Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır, s. 17.).

Kelîma “Amed” di dîroka Herodot da jî derbas dibe: “B.M. di sala 920’an da ji Qiralên Aşuriyan Salmansar’ê yekemîn herêmê Amîd dagirtibû. Piştî ku Qiralê Aşuriyan Aşur-nasîr-Bal (B.M. 884-859) kete memleketê Kummuh (Urfa-Malatya), vegerya başûr, ji çiyayê Arkanîa (Arkanîa-Arkanî: Ku evro qezekî Diyarbakir e) û Amadanî derbas bû û bajarê Damdamusa dagirt. Li wê derê 600 û li bajarê Amedî/Amîda/Diyarbakir’ê da jî 3000 kes daleqand” (Ş.B. Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır, s. 20).

1) Di vê babetê da binêrin: İ.N. Dilmen, “Diyarbakır Sözüünün Orjinleri Üzerine”, di eynî kovarê da Rûp. 88-98, İ. Sungu, “Diyarbakır Adı Üzerine Notlar” Rûp. 98-100 Prof. H.R. Tankut, “Diyarbakır Adı Üzerine Toponomik Bir Tetkik” Rûp. 101-112 (Ankara 1937) û hwd. (Ş.B. Age s. 23).

* Amîda Reş: Vî navê Kurdi me nivisandîye. Bi Osmanî jî dibêjin “Amîdî Suda”.

Li gora nêrîna TDK: “Kelîma Diyarbekir bi eslê xwe wergera kelîma “Amîday” e, li dawîya vekolînên me da hatiye fêmkirin ku ev kelîma di Tirkîya kevnare da têtê mana paxirê (sifir). Pêşiyê ji vê herêmê ra digotin Amîday, ku têtê mana cihê paxir (diyarê paxir). Tirkên ku piştra hatin vê herêmê, bi mana ‘cihê paxir’ navê “Diyarbakır” lêkirine. Ev gotin jî di nava pêvajokê de bi tesîra Arabî û etîmolojiya xelkê şeklê ‘Diyari Bekir’ girtiye” (Ş.B. Anîtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır, s. 23).

Di berdewamiya gengeşeyên li ser navê “Diyarbekir” da, gerendekerên TDK weha dibêjin: “Kelîma “Amîda” ku navê bajar yê kevnare ye, di lûgata Yakutî da têtê mana paxir (sifir) yan jî pereyên paxirî. Kelîma ‘diyar’ jî, di lûgata Yakutî da bi mana xaniyê ji kelîma “dîer” çêbûye”. (Ş.B. Afirandîna ku navê wî dibuhûre. (And) R.8) Dîsa bi gotina wan: “Navê ‘Diyarbekir’ yê kevnare, “Amîda” ye. Li gora kevneşopî û çanda Tirkên, ev gotin navê xwedayê jîyan û şerabê ye (Binêrin: Potanin Oçer, S. Zap. Mogol, WS. 796). Li gora ‘Güneş Dil Teorisi’, divê ev gotin bi eslê xwe “Amîdağ” be (Ş.B. Age. S. 11).

Xwendevanên hêja, nêrîna TDK bi hawakî zelal û vekirî dijberiya nava xwe rava dide. Lewra, yên ku bi mantiqî bifikrin dê têteliya Amîda-Amîdağ û Diyar-dîer baştir bibînin. Her wekî ku li jorê jî têtê fêmkirin, hin kes û qurim bi navê lêkolînvanî û zanyarî, dixwazin ku xewn û xeyalên xwe, wek rastiya dîrokî bi me bidine qebulkirinê. Çawa ku hinekan di pişkaftina gotina “Amazon”ê da digotin: Ev gotin jî “ama uzun” a Tirkî hatiye çêkirin. Bi vî hawayê, digotin ku “qita Amerîqa” jî aliyê Tirkên ve hatiye keşif kirin. Goya Tirkekî ber û berê çemê “Amazon”ê çûye û dîtiye ku pîrr dirêje, gotiye: “ama uzun” e û li ser vê gotina wî, navê wê çemî bûye “Amazon”. Belê, ev kesan bi navê rastiye çî dibêjin û çî çîrokan lihev tînin bila bînin, tiştê berbiçav û zelal ev e; ku amaca wan ne xwarine tirî ye, lêdana nator e.

Di nava pêvajoka dîrokê da li ser gûherîna navê “Diyarbekir”ê, Şevket Baysanoğlu weha dibêje: “Berê îslamîyê navê bajêr “Amîd” bû, navê “Dibarî Bekr” cara yekemîn di dawîya esrê duyemîn yê hîcrî û destpêka esrê sêyemîn yê hîcrî da, di afirandîna Vâkidî û hevdemiyên wî; İsmâil İbnî İshakî Temimî, Ebî İsmâil-îl-Ezdîn, Ebu Hanîfe tît Deynevesî, İbnî kuteybe, Tebarî û Belazîrî da hatiye dîtin (Ş.B. Age. s. 14-17).

Li ser daxwaza serekkomar Mustafa Kemal, di 10.12.1937’an da bi Biryara lejna Wezîran* ya bi jimara 7789’an navê “Diyarbekir” dibe “Diyarbakır”

Em naxwazin gotinê pîrr dirêj bikin, bi kurtayî amaca vê nivîsê ev e; ku bala xwendevanan bikşîne ser van pirsan: Ewan kesên ku li ser navê “Diyarbekir”ê ewqas bi girîngî disekin, gelo çira li ser navê Kayserî, Ankara, Kütahya û hwd. ew-

* Ku ev biryarnama di 18.12.1937’an da, bi jimara 3786’an di Rojname Resmî da hatiye weşandin.

qas nasekinin? Li ser navê Diyarbekir, Dêrsim, Entab, Urfa û Meraş'ê qanun têne çêkirin û derxistin, gelo li ser navê bajarên di çira qanun nayin çêkirin û derxistin? Divê meriv bi balkêşî, kûr û fire li ser bersiva van pirsan hûr bibe.

Bi dîtina me, koka vî nevî (Diyarbekir'ê); Diyarbekir: Diyar+bi+kir (kire/kerre**). Yanî herêmê bi kevir. Her wekî bi çav jî tête dîtin ku bi furîna (teqîna) çiyayê Qerejdax'ê (Qerejdaw'ê) lehiya law'ê ber bi çemê Dicle'yê ve hatiye. Piştî ku gihiştîye kenarê çemê Dicle'yê, çem bûye asteng ku nehiştîye ew lehiya law'ê derbasê rohelatê wî bibe. Bi tenê em vî dibînin ku law ji ber pirrbûn û zêdebûna xwe, di nûxtekî da (ku evro ew nûxte, derûdora pira dehderî ye), derbasê rohelatê çem bûye.... Ev bazalt (kevirê law'ê), nûha jî li rohelatê bedenê (kelê) tête dîtin. Qalindiya wî li dora 20 m ye. Ev sînorê Diyarbekir'ê yê

rohelatê ye. Li aliyê roava da jî, ew sînor digîje Soreg'ê û li hin ciyan da jî ji wî derbas dibe. Li aliyê bakurê da jî digîje herêmê Tulik'ê (derûdora Devegeçidî). Li aliyê başûr da jî digîje nêzikê Torosên Başûr.***

Her wekî li jorê jî hate zanîn, “Diyarbekir” navê vî herêmê ye, ku me çarke-nar sînorê wî rava daye. Lewra, ew herêm serapa bi wan kevirên bazaltên ku ji ber furîna çiyayê Qerejdax'ê hatine raweşandin ve dagirtîye. Ewan kesên ku li ser kelîma “Diyarbekir”ê bi hinkî hawayên hevnegirtî pişkafîtin û lêkolîn çêkirine, ji ber ku Kurdî nizanibûne, ketine nava gelekî çewtî û zorkêşîyan. Sedemê vê çewtî û hevnegirtinê, ji ber ku wan lêkolînavanan çand û termînolojiya wî xelkê ku bi hezar salan li ser wî hermê da jiyaye, ne girtine ber çavan. Wan lêkolînavanan dixwazin ku fikir, pêjin, xewn û xeyalên xwe wek rastiya dîrokî û zanyarî bi me bidine qeblû kirinê. Çawa ku di deme Osmaniyan da hinekan dixwestin ku kelîma “İstanbul”ê bi kelîma “İslambol”ê bigûhêrin. Û di gelek nivîsên xwe da jî bi cî kirin. Lêbelê di nava ronakbîrên wê demê da rûmet nedît.

Navê vî bajarî ha “Diyarbekir” be, ha “Diyarbakır” be tiştêkî nagûhêre. Hem jî, “Diyarbakır” di lîteratorê da ji ber ku qenc bi cî bûye, li goh jî xweş tête. Amaca vê nivîs û gengeşeyê ev e: Em dixwazin ku kelîma “Diyarbekir”ê yan jî “Diyarbakır”ê bigîje heqê xwe yê dîrokî, etnolojî û herêmiyê.

Ji bo vê nivîsê bêtir me ji pirtûka Şevket Baysanoğlu; “Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır” îstifade kir. Dil dixwest ku ev lêkolîna me ya li ser navê “Diyarbekir”ê, ji pozê qeleme berêz Baysanoğlu birijyana nava wê pirtûka wî ku me gelek tişt ji wê neqil kiriye. Lewra, Baysanoğlu jî bi hindikî qandê me Kurdî dizane. Lêbelê ez nizamim wî çira bala xwe nedaye yan jî nexwestîye ku lêkolîna navê “Diyarbekir”ê bi etîmolojîya Kurdî bipişkêfe.

** Kîrre/kerre: Di zareva Dimilî da bi mana “kevir” e.

*** Ji bo agahdariyekî têrgihiştî û naskirina dewreyên jeolojîk, binêrin çavkaniyên vê babetê.



NEWROZ

PÎROZ BE